
# Têkoşîna Sara û Sêvêyan mezin dikin



Tevgera Jinên Azad (TJA) diyar kir ku ew ê li dijî komkujiyên Parîs û Silopiyê li her qada jiyanê berxwedanê derxin asta herî bilind

**Minetdarê sekna jinên azad in**

TJA'yê ji ber salvegera kuştina siyasetmedarên jin ên kurd ên li Parîs Silopiyê hatin qetilkirin daxuyanî da û diyar kir ku ew minetdarê sekna wan in.

**Ji TJA'yê îlana hefteya têkoşînê**

TJA'yê da zanîn ku dê hefteya 5 û 9'ê Çileyê wekî Hefteya Têkoşîna li dijî Komkujiya Jinan pêşwazî bikin û li her derê têkoşînê bê eman bidomînin...

→R2



BI TÊKOŞÎNA XWE TÊN BIBÎRANÎN

Jinên pêşengên xweseriyê Sêvê, Fatma û Pakîze di 4'ê Çileya 2016'an de ji aliyê dewleta tirk ve hatin qetilkirin, tên bibîranîn...

→R2

**JI BO SARAYAN ÇALAKÎ**

## Çalakiyên ji bo edaletê berfireh dibin


- TJK-E ji bo helwesta Fransayê ya li dijî ronîkirina Komkujiya Parîsê dê li seranserê Fransayê bi afîşan hewl bide bala civakê bikişîne...
- KCD-E'yê bi daxuyaniyekê Komkujiya Parîsê lanet kir û ji civaka kurd a li Ewropayê xwest ku 7'ê çileyê li Parîsê tev li çalakiyê bibin...
- Gerîlaya YJA Starê Arîn Agir da zanîn ku Sakîne Cansiz (Sara) ji bo jinên têkoşer efsaneyeke zindî ye û ew jî li ser şopa wê dimeşin...

R2

ROJEVA Medya

5 Çile Pênçşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 56






## Ji bo qereqolên Sûrê 'Bismillah'

Hikumeta tirk a piştî hilweşandina Sûra Amedê îdia kir ku ew ê Sûrê bike wekî Toledoya Îtalyayê derket holê ku li Sûrê 6 qereqolan çêdike. Billboardên ku li ser wêneyê Serokwezîr Bînalî Yildirim û "Ji bo Sûrê bismillah" hatine nivîsandin li gelek deran hatine daliqandin. Welatiyan bertek nîşanî helwesta durû da...


Medya Rûpel - 3



## Artêşa tirk li dû provokasyonê ye

YPG'ê diyar kir ku helîkopterên ku tê texmînkirin ên artêşa tirk in, di şeva 3'yê çileyê de derbasî Rojava bûne. Helîkopterekê bejahiya gundê Tahûnê yê Girkê Legê gulebaran kir. Piştî êrîşê jî her sê helîkopter ji milê Til Koçer ve ji Rojava derketin. YPG'ê da zanîn ku şervanên wan êrîş bê bersiv nehiştine...

Medya Rûpel - 5



## Qirkerdişê Dêrsimî yo dîyin o

Endamê Komîteya Bawerî û Şaran yê KCKyî Cîhan Erenî derheqê dagîrkerî û polîtîkayê îskanî yê dewleta tirk de va 'hedefê dagîrkerîya tirkî serra 1925 ra nata asîmîlekerdiş û tirkkerdişê kurdan o' û wina domna: "Dewlete kurdîya ma seba mergê xo vînena. Ganî ma vera nê hêrişan de xover bidî."...

Medya Rûpel - 11

# Îşkenceya kurdî

Li Tirkiyeyê li ser navê kurdîtiyê çi hebe rayedar hewl didin tune bikin. Bajaran hildiweşînin, dikujin, digirin, îşkenceyê dikin. Li Girtîgeha Şakranê ji ber ku zarok di navbera xwe de bi kurdî axivîne 50 gardiyayan bi hev re îşkence li wan kir

**KURDÎ QEDEXE YE**

Du zarokên ji Kobanê ku li Şakranê girtî ne, dema di navbera xwe de bi kurdî axivîne gardiyanan ji wan re gotiye; "ev der Komara Tirkiyeyê ye, li vir kurdî qedexe ye". Li gel ku zarok bi tirkî nizanin jî rastî îşkenceyê hatine.

**GARDIYANÊN ÎŞKENCEKAR**

Parêzer Yunus Emre Gunes ê ku bi zarokan re hevdîtin pêk anî, haya wî ji îşkenceyê çêbû û da zanîn ku 50 gardiyanan îşkence li 6 zarokên kurd kiriye û piştre jî du hefte cezayê disîplînê li wan biriye... RÛPEL - 3




**Pêşî kuştin piştre gotin bê guneh e**

Dayika Sebîha ji Minbicê ye û DAIŞ'ê bi qetilkirina kurê wê Ahmet kezeba wê dax kiriye. Dayika Sebîha dibêje pêşî kuştin piştre gotin bê guneh e... R - 5

**Déjà vu... Nivîsa Reşo Wasif**

→R4

## Li şûna îstîfa bike OHAL'ê dirêj dike




Nûnerên partiyên siyasî yên dijberî OHAL'ê ne li hemberî daxuyaniyên ku ji aliyê rayedarên hikumetê ve ji bo dirêjkirina OHAL'ê hat dayîn, nerazîbûn nîşan da û diyar kir ku hikumet li şûna ku îstîfa bike OHAL'ê dirêj dike. Seroka Giştî ya EMEP'ê Selma Gurkan, Endama DÎB'ê parlamentera berê ya CHP'ê Bînnaz Toprak, Serokê Partiya Şoreşger Ufuk Gollu, Seroka Giştî ya ESP'ê Çiçek Otlu bertek nîşanî dirêjkirina dema OHAL'ê da. Rêxistinên ku ji bo OHAL bê rakirin kampanyayê dimeşînin, nirxandina "Hikumeta AKP'ê ya ku berpirsyara pêvajoyê ye li şûna îstifa bike di nava lêgerîna dirêjkirina OHAL'ê de ye" kir... *RÛPEL - 6*

## Belgeya OHAL'ê sexte ye

Hikumeta AKP'ê OHAL 3 mehên din jî dirêj kir. HDP'ê îdia kir ku di belgeya ku hikumetê ji bo dirêjkirina OHAL'ê daye, sextekarî hatiye kirin.Di belgeya ku HDP'ê li meclisê anî rojevê de hat gotin ku ji bo dirêjkirina OHAL'ê di 3'yê çileyê de MGK'ê biryara tavsiyeyê daye hikumetê û Lijneya Wezîran jî li gorî vê yekê xwestiye OHAL'ê dirêj bike. Parlamenterên HDP'ê der barê belgeyê de ji hikumet û serokatiya meclisê daxuyanî xwest... *RÛPEL . 6*

Ji bo Sûriyeyê **federasyon guncaw e** R4

Pêşmerge li gel gerîlayan in R7

R7 Partiyên Rojava: **Dem dema yekitiyê ye**

www.arsivakurdi.org

# Jin ji şervanan re xwarinê çêdikin

**LI ROJAVA** ku şoreşa jinan lê pêk tê, jin tu demê vala namînin. Operasyona Azadkirina Reqqayê ya Xezeba Firatê ku pêngava yekemîn di 5'ê mijdarê de bi dawî bû û ya duyem jî di 10'ê kanûnê de dest pê kir. Jin jî ji şervanan re xwarinê çêdikin. Bi destpêkirina pêngava Xezeba Firatê re bi sedan ciwan tev li YPG û YPJ'ê bûn û jin jî şervanan li eniyan bi tenê nahêlin. Rojê ji hezar kesî re xwarin tê amadekirin. Jinan diyar kir ku ew naxwazin şervanan tenê bihêlin. Jinên li aliyekê xwarinê çêdikin li aliyê din jî dibêjin 'ew azadiyê didin me, em jî xwarineke germ didin wan.' Jinan di dawiyê de wiha got: "Li dijî qehremaniya ew dikin, a em dikin pir kêm e." **REQQA – ŞÛJIN**





# 5 û 9'ê Çileyê hefteya TÊKOŞÎNÊ YE

**Tevgera Jinên Azad (TJA) ragihand ku ew ê li dijî komkujiyên li Parîs û Silopiyê li her qadê berxwedanê geş bikin û destnîşan kir ku ew ê 5 û 9'ê Çileyê wek hefteya têkoşîna li dijî komkujiyên jinan ên siyasî pêşwazî bikin**



Tevgera Jinên Azad (TJA), ji ber salvegera kuştina siyasetmedarên jin ên kurd, ku di 5 û 9'ê Çileyê de hatin kuştin, daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku ew minetdarê sekna wan a azadiyê ne.

TJA'yê bi bîr xist ku şoreşgerên kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez beriya niha bi 4 salan li Parîsê, siyasetmedar Sêvê Demîr, Fatma Uyar û Pakîze Nayir jî beriya niha bi salekê ji aliyê hêzên dewletê ve li Silopiyayê hatin kuştin. TJA'yê da zanîn ku kuştina Sêvê, Fatma û Pakîzeyê hefteyek beriya Komkujiya Parîsê, rasthatin nîn e û diyar kir ku ev komkujî jî bi zanebûn hatiye plankirin û wiha hat gotin: "Ev hevalên me bi vîn, berxwedan û dildariyeke bêhempa ya azadiyê bûn malê dîrokê. Wan bi destên xwe yên vala, lê bi dilê xwe yê mezin û bi cesareta xwe mêtingerî têk bir."

TJA'yê destnîşan kir ku ji ber dewlet têk çû, li hemberî jin, zarok û gel komkujiyên hovane pêk anîn û ev tişt hat ragihandin: "Bi şiyara 'Li dijî qetlîamkerên li Parîs û Silopiyayê dê berxwedana azadiyê bi ser bikeve' em têkoşîna xwe li her malê, li her kolan û gundî, li her bajarî bi rêxistin bikin, kûrtir bikin û çalakiyên xwe mezintir bikin. Em ê 5 û 9'ê Çileyê wek hefteya têkoşînê ya li dijî komkujiyên li dijî jinan ên siyasî pêşwazî bikin. Em vê sozê careke din didin şehîdên xwe, jinan û gelê xwe. Kujer dê têk biçin, jin û gelê me dê bi ser bikevin." *AMED - ANF*

## 'Mirin be jî serkeftin be jî bila bi hev re be'

Di ser qetilkirina 3 jinên siyasetmedar ên kurd Fatma Uyar, Pakîze Nayir û Sêvê Demîr ên di 4'ê Çileya 2016'an de hatin qetilkirin re salek derbas bû. Di qedexeya derketina derve ya 14'ê kanûna 2015'an a li navçeya Silopiyaya Şirnexê hat îlankirin de leşker û polîsan bi dijwarî êrîşî gelê navçeyê kir. Li gel hemû êrîşên dijwar jî gelê navçeyê taxên xwe bernedan û heya dawiyê li ber xwe da. Her sê jinên siyasetmedar Fatma Uyar, Pakîze Nayir û Sêvê Demîr jî gel terk nekir û bi gel re xebatên siyasî meşandin û ji aliyê dewleta tirk ve hatin qetilkirin.

Hevseroka Meclisa Gel a Silopiyayê Pakîze Nayir bi temenê xwe yê ciwan lehengiya rêveberiya xweser dikir û di nava gel de xebat meşandin. Nayir dema hêzên dewletê bi dijwarî êrîşî wan û gelê Silopiyayê dikir jî li gel hevalên xwe Sêvê û Fatmayê tev digeriya. Nayirê berxwedan û têkoşîna gelê navçeyê jî bi rêya telefonê ji hemû cîhanê re ragihand û wiha gotibû: "Ger Botan qezenc bike dê hemû mirovahî qezenc bike." Ew jî bûn gotinên Nayirê yên dawî.

**MIRIN Û SERKEFTIN**

Dayika Pakîze Nayir Behiye Nayirê qala keça xwe kir û diyar kir ku keça wê ji bo mafê xwe yê siyasî bi dest bixwe ji bo gelê navçeyê di xebitî û hevserokatiya gelê xwe dikir û wiha got: "Keça min li gel hemû şert û mercên zehmet jî li cem gelê xwe bû. Pakîzê her tim di got çi dibe bila bibe ez dest ji heval û gelê xwe bernadim û biçin ger mirin be bila bi hev re be, ger serkeftin be jî bila bi hev re be. Ciwan bû lê barê herî zehmet dida ser milên xwe. Şev û roj ji bo jiyanek hevpar di nav gel de dixebitî. Di ser kuştina Pakîzê û hevalê wê re salek derbas bû lê hê jî der heqê kuştina wan de tu lêpirsîn nehatine vekirin. Faîlên her sê jinan diyar in û her roj di wan kolanan de li ber çavên her kesî tên û diçin. Her tim em ê hesab ji kujerên 3 jinan bixwazin."

**ŞIRNEX - DÎHABER**

## Li Ewropayê çalakî pêk tên

Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) ji ber salvegera qetilkirina sê jinên şoreşger Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez daxuyaniyeke nivîskî weşand. KCD-E'yê da zanîn ku çar sal di ser komkujiya Parîsê re derbas bûn lê belê bûyer nehatiye aşkerakirin û got ku li rêya parêzer hatibû gotin ku tetikkêş Omer Guney miriye. KCD-E got ku mirina Guney bi guman e û ji ber xwe de jî ev yek pêk nehatiye.

KCDK-E'yê da zanîn ku delîl nîşan didin ku komkujî ji aliyê MÎT'ê ve bi hevkariya dewleta Fransayê hatiye kirin ji holê hatine rakirin û ev tişt hat gotin: "Ev rewş hêrsa me û têkoşîna me ya li dijî faşîzmê jî mezintir dike û kiriye. Ji ber vê yekê em ê bi hêrs û biryardariyeke mezin di 7'ê çileyê de li bajarê Parîsê bin û ji dewleta Fransayê re bêjin ku ev komkujî dê serê wê neyê girtin." KCDK-E'yê bal kişand ser tespîta Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a li ser Komkujiya Parîsê ku wiha gotibû; "Ha ez kuştim, ha Sakîne; ev yek komkujiya duyemîn a Dêrsimê ye. Yên ku naxwazin pirsgirêka kurd çareser bibe û di şer de israr dikin, bi vê komkujiyê bersiva dewamkirina siyaseta înkar û tunekirinê daye." Her wiha FEDA'yê jî bi heman armancê daxuyaniyek da û bang li gelê Ewropayê kir ku beşdarî çalakiyan bibin. *ANF*

## Sara efsaneyeke zindî ye

Gerîlaya YJA Starê Arîn Agir têkildarî lehengiya yek ji pêşengên destpêkê yên jin ên PKK'ê Sakîne Cansiz ku di 9'ê Çileya 2013'an de li Parîsê hat qetilkirin axivî û diyar kir ku Cansiz pêşenga têkoşîna jinên kurd e.

Arîn Agir axaftina xwe bi zimanê almanî kir û anî ziman ku ew dixwaze têkildarî Cansiz çend gotinan bîne ziman û wiha got: "Heval Sara yek ji jinên destpêkê bû di nava tevgerê de cih girt. Ji bo jinên li azadiyê digerin, li dijî neheqiya dewletê tev digerin, bi pêşengî rabû. Ji bo jinên ku pergala dewletê û malbata feodal qebûl nekir, têkoşîna azadiyê meşand."

Agir bal kişand ser berxwedana Cansiz a li girtîgeha Amedê û da zanîn ku wê tu carî li hemberî dijmin serî netewand û wiha axivî: "Hevala Sara jineke gelekî wêrek û bê tirs bû. Di pirtûkên xwe de jî destnîşan dike ku divê mirov, bi taybetî jî jin serê xwe li hemberî neheqiyê netewînin. Hevaleke bi cesaret û wêrek bû."

Arîn Agir da xuyakirin ku Cansiz rêya azadiyê ji bo jinên kurd vekiriye û herî dawî wiha got: "Mirov dikarin vê bêjin: Hevala Sara rêya azadiyê li hemû jinan vekir. Ji bo jinên li Ewropa û Kurdistanê bi rola pêşengiyê rabû. Jinan dane ser şopa Hevala Sara. Hevala Sara dê her tim di dilê me de bijî. Ew ji bo me efsaneyeke zindî ye, em ê wê tu carî ji bîr nekin." *BEHDÎNAN - ANF*



## 'Em heqîqetê dixwazin'

Ber bi nêzbûna 4'emîn salvegera Komkujiya Parîsê ku yek ji pêşengên PKK'ê Sakîne Cansiz, Nûnera KNK'a Parîsê Fîdan Dogan û endama Tevgera Ciwanan Leyla Şaylemez çalakiyên ji bo lêgerîna edaletê ya jinan jî zêde dibin. Piştî ku Fransayê daxuyan kujerê sê jinên kurd Omer Guney li girtîgehê miriye da di pêşengiya Tevgera Jinên Kurd a Ewropayê (TJK-E); Navendên Civaka Demokratîk a Fransayê ji bo şermezarkirina dadgeriya Fransayê di serî de li Parîsê û li seranserê Fransayê afîşên ku li serê wêneyên her sê jinan heye û "Em edaletê dixwazin" dinivîse dadiliqînin û dixwazin bala raya giştî a Fransayê bikişînin ser komkujiyê. *PARÎS - ANF*



## Ew tu caran ji me dûr neketin

**HEVALA HER SÊ** jinên ku hatin qetilkirin û aktîvîsta TJA'yê ya herêma Botan Harîka Peker qala hevalê xwe kir û nêzîkatiya xwe ya bi Fatma û Sêvê re bi gotinên keyfxweş anî ziman. Peker dema behsa bîranînên hevalên xwe kir hêsir ketin çavên wê. Hevaltiya Peker û Fatmayê li girtîgehê dest pê dike. Her du heval di girtîgehê de her tim xeyalên dema ji girtîgehê derkevin ew ê çawa xebatan bimeşînin dikirin. Fatma û Sêvê bi birêxistinbûna xwe dihatin naskirin. Sekna her du jinan di nav gel de û di nav hevalên girtîgehê de jî pir cuda bû, ji aliyê her kesî ve jî dihatin hezkirin. Mirinê Fatma ji wan dûr nexistiye û ew her tim bi hevaltiya wê tev digerin. Sêvê Demîr jî bi fedekariya ku ji bo gelê xwe kir, hat naskirin. Ew bi hêza xwe ya berxwedêr û wêrek pêşengî kir. Jineke ku di kar û xebatê de serkeftî bû. Yên ku hevaltiya Sêvê kirin pir bi şans bûn. Ji ber ew hevaleke têkoşer bû. Der barê vê komkujiyê de dewletê tu daxuyanî nedan. Komkujiya ku li Parîsê pêk hat li Botanê jî hat kirin.



## Ji xwîna reglê wêne çêkir

Tîmî Pall ya ku ji xwîna xwe ya reglê wêne çêkir di çêkirina wêneyê de tenê tampon û pêçiyên xwe bi kar anîn. Tîmî ya ku 9 mehan li ser vî wêneyî xebitî, wiha got: "Ez bi dilopek cerebe di xweşikbûna êşê, girîngiya serdema reglê ku çawa bi awayê erênî hemû kesayeta min xwedî dike gihîştim." Tîmî navê berhema xwe Diary Of My Period (Rojeva Xwînbûna Regla Min) danî û berhema ku Tîmî di 9 mehan de derxist holê jî wêneyê pitikê yê di zikê dayikê de ye. **AMED - ŞÛJIN**

www.arsivakurdi.org

# Li Şakranê ji ber ku bi tirkî nizanin rastî îşkenceyê hatin

**Li Girtîgeha Zarokan a Şakranê hat diyarkirin ku bi hinceta 2 zarokên ku ji Kobanê ne bi kurdî axivîne, tevî 4 zarokên li heman koguşê, bi gotinên nîjadperest û zayendî rastî îşkenceyeke fîzîkî ya 50 gardiyanan hatine**

Li Girtîgeha Zarokan a Şakrana Alîaga ya Îzmîrê, hat diyarkirin ku zarokên bi navê M.A., Î.A., A.H., M.H.T., M.B. û N.M. ên temenê wan di navbera 15-17 salan de ne, ji paş ve hatin kelepçekirin û rastî îşkenceyê hatine. Ji parêzerên Platforma Hiqûqnasên Azadîxwaz (OHP) Yunus Emre Guneş ê di 30'ê kanûna 2016'an de li girtîgehê bi zarokan re hevdîtin pêk anî, anî ziman ku li girtîgehan îşkenceya li ser girtiyan veguheriye rewşeke sîstematîk.

Guneş ragihand ku hefteya borî 6 zarok rastî îşkenceya gardiyanan hatine û wiha behsa bûyerê kir: "Di dema lêgerîna rûtîn de, 2 zarokên ku ji eslê xwe ji Kobanê ne ji ber ku bi tirkî nizanin, di navbera xwe de bi kurdî diaxivin. Gardiyanên dîtin her du zarok bi kurdî diaxivin, ji zarokan re got, 'ev der Komara Tirkiyeyê ye. Zimanê fermî tirkî ye. Li vir axaftina bi kurdî qedexe ye' û bi vî awayî heqaretî li zarokan kirine. Ji ber zarok ji Kobanê ne, bi tirkî nizanin û her çiqas zarokên din ev rewş diyar kirine jî gardiyanan zarok tehrîk kirine û ew tehm dane."

**ÎŞKENCEKAR**

Guneş ragihand ku piştî bûyer xwe gihandiye îdareya girtîgehê, midûrê girtîgehê tevî 50 gardiyanan bi ser koguşa girtiyan de girtiye û 6 girtî rastî lêdanê hatine û paşê ew birine hucreyên kamera lê tune ne. Guneş anî ziman ku paşê dest û lingê her 6 zarokên girtî hatine kelepçekirin û wan birine hucreyên cuda û wiha axivî: "Bi qasî 20 deqîqeyî bê navber, bi awayekî giran îşkence li zarokên girtî hatiye kirin. Di dema îşkenceyê de gardiyanan bi gotina 'terorîstno' bi ser zarokan de kirine qîrîn û ev îşkence li ber vegotinên zayendî û nîjadperestî hatiye kirin."




**CEZAYÊ CIVAKÎ**


Guneş anî ziman ku zarok bi qasî 3 saetan bi kelepçikirina ji paş ve hatine rawestandin û paşê ew birine revîrê û got ku doktorê girtîgehê tenê li destê zarokan mêze kiriye, bûyera derbkirinê rapor nekiriye. Guneş destnîşan kir ku piştî bûyera derbkirinê, îdareya girtîgehê der barê 6 zarokan de lêpirsîna dîsîplînê daye destpêkirin û wiha axivî: "Der barê 6 zarokên girtî de 15 roj cezayê qedexeya derketina faliyetên civakî hatiye dayîn." *ÎZMÎR - DÎHABER*

## Bi tonan axê dikişîne û nan dibe mala xwe

Di salên 90'î de li herêmê ji ber polîtîkayên şer bi hezaran malbat ji neçarî koçî Edeneyê kir û li zeviyên Çûkûrovayê dest bi xebatê kir û ji bo debara jiyana xwe têdikoşin. Yek ji van malbatan jî malbata Mendeş e ku di 1994'an de ji Gundê Aladdînê yê Dara Hênê ya Çewlîgê koçî Edeneyê kirin.


Cumalî Mendeş ku tevî hevjîna xwe li serayê dixebite diyar kir ku li gel nexweşe jî rojê bi heqê 50 TL'yî bi tonan axê dikişîne û bi vî awayî li zarokê xwe dinere. Mendeş wiha got: "Li gel ji kezeba xwe nexweş im jî ji bo muhtacî kesî nebim dixebitim."

Mendeş anî ziman ku ew wek karên rojane diçe serayan û li wir darên porteqal, lîmon û hinaran dikesixîne û ji mesrefên zarokên xwe diçin dibistanê derxînin, hevjîna wî jî li gel wî li ser erdan dixebite. Mendeş da zanîn ku keçeke wî diçe zanîngehê û zarokên wî yên din jî diçin dibistana seretayî. Mendeş ragihand ku ew tevî hevjîna xwe bi sedena erebokên destan ên axê dikişînin serayê û wiha axivî: "Tevî me 13 kesên din jî hene, karekî zehmet e. Em ji bo her xeteka serayê 100 ereboka axê dikişînin. Her xetek bi qasî 40 metreyî dirêje û bi qasî 80 santîmî jî fireh e. Li vê serayê petat tên çandin. Em bi tonan axê dikîşin serayê." *EDENE - DÎHABER*



## Ji bo qereqolan 'Bismillah'

Li navçeya Sûrê ya ku ji bo gelek şaristaniyan malovanî kiriye ji bo projeya ku dê 6 qereqol û riyên "ewlehiyê" bên çêkirin billboardên ku li ser wêneyê Serokwezîr Bînalî Yildirim û nivîsên "Ji bo Sûrî bismillah" û "Sûr bi hezkirinê bilind dibe" hatin daliqandin. Welatiyên Sûrê bertek nîşanê vê bblboard û planên AKP'ê dan.




Halîme Tozlu ku li taxa Hasirlî ya Sûrê rûdine da zanîn ku ew projeya dewletê ya Sûrê qebûl nakin. Tozlu diyar kir ku ew naxwazin bi qereqolan re bijîn û wiha got: "Ev salek e ku tim me dikujin. Jiyan li me herimî. Êdî bila dewletê destê xwe ji ser me rake û dest nede malên me."

Fehmî Tokmak a ku li taxa Melîkahmet rûdine jî got ku projeya Sûrê bi sedema wan bidin koçberkirin tê çêkirin. Tokmak dîroka Sûrê bi bîr anî û wiha got: "Bi hezaran sal in ku van xakan li dijî zilmê serî rakirine. Duh jî zext û zordarî hebû û niha jî berdewam dike. Em ê dev ji malên xwe bernedin. Niha jî li her deverê qereqolê seyar çêdikin û me reht dikin. Ku qereqoleke rûniştî jî çêbikin wê me li ser van axan nehêlin. Bila pê li cesedê min bikin û wiha qereqolê ava bikin. Bila kes hêvî neke ku em serê xwe ji wan re bitewînin. Em ê projeya qereqolê bibin dadgehê."

Ferîde Yaman a ku li Sûrê rûdinê jî dema ku projeya Sûrê bihîst hêstir ji çavê wê herikîn û diyar kir ku li gel ku ew li Sûrê dijîn jî ew nehatine agahdarkirin û got, "Wê malên me xira bikin û bêyî ku haya me jê hebe li şûn wan qereqol û rêyan çêbikin. Em ê malên xwe neterikînin. Bila dewlet vê projeya xwe paşve bikişîne." *AMED - ANF*

## Bav: Em li benda daxuyaniyê ne

Di 24'ê kanûna 2016'an de hat diyarkirin ku DAIŞ'ê li El Babê 2 leşkerên TSK'ê şewitandin û înfaz kirin. Piştre ev vîdeoyên ku tê îdiakirin leşker şewitandine bi rêya medya civakî li civakê hat parvekirin. Têkildarî vê yekê rayedarên hikûmetê gotin ku ew lêkolîn dikin û tu agahiyên cuda nedan. Di ser bûyerê re 13 roj derbas bûn. Lê hêj bersîva bavê leşkeran nehatiye dayîn û malbat nehatine agahdarkirin.

Bavê leşker Seftar Taş ê ji navçeya Aralikê ya Îdirê ku hat idiakirin ku hatiye înfazkirin Aydin Taş, bertek nîşanî rayedaran da û wiha got: "Heta niha tu kesî agahî nedaye me. Em 13 roj in li benda agahiyek zelal e. Di vê rewşê de dê rewşa mirov çawa be?"

Wezîrê Parastinê Fikri Işik gotibû "Raste 3 leşkerên me di destê DAIŞ'ê de ne. Lê ev agahî nehatine teyîtkirin." Berdevkê Serokomar Îbrahim Kalin jî di 26'ê kanûnê de pirsên rojnameger û xebatkarên çapemeniyê nebersivandibûn û pirsên wan bê bersîv hiştibûn. *ÎDIR - DÎHABER*



## Pirtûk û şal û şepik bûn delîlên sûc

**Li Muglayê, bi îdiaya têkiliya wan bi êrîşa bombeyî ya li Stenbolê ku 45 kes tê de miribûn re heye, kesên hatin binçavkirin û paşê hatin girtin, derket holê ku kincên wan ê herêmî û pirtûkên Mehmet Uzun ên li mala wan wek delîlên sûc hatine hesibandin. AKP rûyê xwe yê dijmer ya li hemberî çand û pirtûkan nîşan da. MUGLA**



## Ji windayan dewlet berpirs e

**Dayikên Şemiyê yên her hefte ji bo windayan tên cem hev ji lêgerîna xwe ya edaletê dest bernadin. Vê heftê Enzîle Ozdemîr tev li çalakiya rûniştinê ya ÎHD û xizmên windayan bibû û çîroka hevjînê xwe Mehmet vegotibû. Mehmet li bazara sewalan li kahweyê rûniştibû û ji aliyê sê kesên çekdar bi wesayîtek toros a plakaya wê tune ye ve hat revandin û agahî jê nehat girtin. Hevjîna wî Enzîle dixwaze kujer bên dîtin û berpirs bên darizandin. Her wiha Ozdemîr da zanîn ku dewlet ji kuştinên kiryar nediyar ên salên 90'î berpirs e. AMED**



## 5 roj in di grevê de ye

**Li gorî nûçeya malpera Mafê Mirovan a Hengavî, girtiya kurd a bi navê Sûheyla Mînayî ku li girtîgeha Kirman a Îranê tê girtin, ji bo nerazîbûna li hemberî îşkence û bêrêziya gardiyanên girtîgehê bede, 5 roj in dest bi greva birçîbûnê kiriye. Sûheyla Mînayî 27 salî ye û welatiya bajarokê Dîwanderey bajarê Sine yê rojhilatê Kurdistanê ye. Zêdetirî salekê ye di Girtîgeha Kirman a Îranê de dimîne. SILEMANÎ**



## Nasnameya êrîşkar diyar bû

**Di sersalê de li navenda Şahiyê ya Reîna ya Ortakoya Stenbolê êrîş pêk hat û di êrîşê de 39 kesan jiyana xwe ji dest dan. Piştî êrîşê têkildarî êrîşê li Îzmîrê bi îdiaya "Endamên DAIŞ'ê ne" 5 kes hatin binçavkirin. Her wiha Wezîrê Karên Derve Mevlut Çavuşoğlu, diyar kir ku nasnameya êrîşkarê Reînayê hatiye tespîtkirin, lê navê êrîşkar aşkera nekir. ÎZMÎR**



www.rojevakurdi.org

## Koçberî û tevlibûnê gelê pacahûrara qedand

**LI BOLÎVYAYÊ** bi giştî 36 gelên cuda yên xwecih dijîn. Yek ji van gelan jî gelê pacahûrara ye ku berê li Bolîvyayê hejmara wan 40 hezar bû. Ji 40 hezar kesî tenê 4 kes man. Antropologê Zanîngeha San Andrês a Bolîvyayê Wigberto Rîvero der barê hejmara gelê pacahûrara de li ser hesabê xwe yê Twitterê daxuyaniyek weşand û ragihand ku jina herî dawî ya gelê pacahûrara jiyana xwe ji dest daye û bi vê yekê re hejamara gelê pacahûrara daketiye 4 kesan. Piştî vê daxuyaniya Rîvero, Ajansa Nûçeyan a Bolîvyayê jî der barê jina herî dawî ya gelê pacahûrara nûçeyek amade kir û diyar kir jina pacahûrarayî ji ber penceşêra mîdeyê jiyana xwe ji dest daye. Hat ragihandin ku gelê pacahûrara ji ber koçberî û tevlibûna li nav gelê chacoboyê bi tunebûnê re rû bi rû maye. **SÛCRE**



# 'Yekitiya axa Sûriyeyê di federaliyê de ye'

**Sergei Ryabkov der barê agirbesta Sûriyeyê de axivî. Ryabkov da zanîn ku ji bo yekitiya axa Sûriyeyê formeke nû ya siyasî hewce dike û ev jî avakirina pergala federaliyê ye**



Cigîrê Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergei Ryabkov der barê agirbesta li Sûriyeyê ku bi garantoriya Rûsya û Tirkiyeyê di navbera rejîma Baasê û muxalefetê de hat mohrkirin axivî û gotinên balkêş bi kar anîn. Ryabkov da zanîn ku hêviya Moskovê ew e ku aliyên dê beşdarî danûstandinên Sûriyeyê bibin bigihîjin avakirina pergala federaliyê.

Ryabkov di berdewama axaftina xwe de bi lêv kir ku pêwîstiya gelên Sûriyeyê bi formeke nû ya siyasî ku parastina yekbûna axa Sûriyê bike heye û ev tişt anî ziman: "Ev forma nû ya siyasî dibe ku ji bo yekitiya axa Sûriyeyê avakirina pergala federaliyê be jî."

Ryabkov li gel van gotinên xwe yên balkêş li ser amadekariyên artêşa tirk ên li ser sînorê Rojava jî rawestiya û destnîşan kir ku Rûsya ji amadekariyên artêşa tirk a li ser sînorê Rojava bi fikar e. Ryabkov herî dawî got ku destwerdaneke Tirkiyeyê ya leşkerî dê agirbesta Sûriyeyê xera bike û têk bibe. ***MOSKOV***



## Hevkarekî kujer Amrî hat girtin

Li Almanyayê li dijî kesên ku têkiliya wan bi kujerê komkujiya bazara Noelê Anîs Amrî re heye operasyon hat pêkanîn. Operasyon bi fermana Dozgeriya Federal li wargeheke penaberan a Berlînê hat kirin.

Li gorî agahiyên hatin bidestxistin di operasyonê de kesekî tûnisî bi hinceta ku têkiliya wî bi kujer Amrî re heye hat binçavkirin. Hat ragihandin ku kesê hatiye binçavkirin agahiya wî ji plana komkujiyê hebûye û tê lêkolînkirin ku di kîjan astê de alîkarî daye kujer Amrî.

Beriya niha kesekî din jî bi hinceta ku têkiliya wî bi kujer Amrî re heye, di serdegirtina malan de hatibû girtin. Kujer Amrî piştî ku li paytext Berlînê li dijî bazareke Noelê komkujî pêk anî derbasî Îtalyayê bû û li bajarê Mîlano yê Îtalyayê di encama operasyonekê de hat kuştin. **BERLÎN**

## Valls li dijî Tirkiyeyê ye

Serokwezîrê berê yê Fransayê Manuel Valls ku beriya mehekê ji bo namzetiya serokomariya Fransayê ji serokwezîrtiyê îstîfa kir û bû bernamzetê çepgirên Fransayê yê serokomariyê. Valls da zanîn ku ew li hemberî tevlibûna Tirkiyeyê ya Yekitiya Ewropayê (YE) ye. Valls li paytext Parîsê di bernameyeke danasîna namzetiya xwe de axivî û diyar kir ku ew ji ber pêkanînên Tirkiyeyê yên antîdemokratîk li dijî tevlibûna Tirkiyeyê ya YE'yê ye.

Çepgirên Fransayê dê di dawiya çileyê de ji bo ku namzetê xwe yê serokomariyê diyar bikin biçin pêşhilbijartinê. Di vê pêşhilbijartinê de tê texmînkirin ku ji bo namzetiya çepgiran Valls bê hilbijartin. Hilbijartinên serokomariyê yên Fransayê dê di nîsan û gulanê de bi 2 tûran pêk bên. ***PARÎS***



## Helîkoptereke leşkerî ya Iraqê ket

Li herêma Bêcî ya parêzgeha Selahaddînê ya Iraqê ji ber sedemeke nediyar helîkoptereke artêşa Iraqê ket. Arteşê der barê ketina helikopterê de daxuyaniyek da û bêyî ku agahiyên berfireh parve bike tenê ketina helîkopterê piştrast kir. Li gel ku der barê hejmara kesên di helîkopterê de agahiyek nehatiye parvekirin jî tê îdiakirin ku hemû kesên di helîkopterê de jiyana xwe ji dest daye. Her wiha cenazeyên 80 xwendekarên Zanîngeha Leşkerî ya Hêzên Hewayî ya Iraqê, li akademiya leşkerî ya bajarê Tikrîtê hat dîtin. Çeteyên DAIŞ'ê di 2014'an de piştî êrîşkirina li ser akademiya leşkerî ya bajarê Tikrîtê zêdetirî hezar û 700 xwendekarên Zanîngeha Leşkerî ya Hêzên Hewayî ya Iraqê qetil kiribûn. ***BEXDA***



## Rojnameger Şewqî hat rizgarkirin

Rojnameger Efrah Şewqî ya ku beriya çend rojan li paytexta Iraqê Bexdayê ji aliyê kesên nasnameya wan ne diyar ve hatibû revandin, hat azadkirin. Rojnameger Şewqî piştî ku hat azadkirin, xwe gihand malbata xwe.

Li gel ku Şewqî hatiye azadkirin jî rayadarên Iraqê der barê revandin û azadkirina wê de tu daxuyanî nedan. **BEXDA**

## Li Komara Gravên Fîjî erdhej pêk hat

Li Komara Giravên Fîjî yên Okyanûsa Pasîfîkê bi şîdeta 7,2'an erdhej pêk hat. Piştî erdhejê ji aliyê rayedarên Komara Giravên Fîjî ve daxuyaniyeke hişyariyê hat dayîn. Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku li dora peravên Fîjî dibe ku pêlên xurt ên tsûnamiyê çêbin. Li sedan giravên Fîjiyê 900 hezar mirov dijîn. **SUVA**

## Li Filîpînan girtî ji girtîgehê reviyan

Li herêma Cotabato ya Filîpînan komeke ku ji Eniya Rizgariya Îslamî ya Moroyê veqetiyaye bi armanca rizgarkirina endamên xwe yên girtî êrîşî girtîgehekê kir. Di navbera vê komê û hêzên ku ewlehiya girtîgehê digirtin de şer û pevçûn derketin. Di encama şer û pevçûnan de 150 girtiyan ji şer û pevçûnan îstîfade kir û ji girtîgehê reviyan. **MANÎLA**

# Déjà vu

Girêk

**Reşo Wasif**

Bi serpereştiya Rûsyayê û aktorên herêmî Îran û Tirkiyeyê li ser çarenûsa Sûriyeyê trafîkeke dîplomasiyê ev demek e tê meşandin. Heta piştî Hevpeymana Moskovê -ya di navbera aliyên navborî de di kanûna 2016'an de hat îmzekirin- biryar hat dayîn ku di nav vê mehê de li Astanaya Kazakistanê alî li hev rûnên.

Lê xuya ye ku dê Astana ji bibe wekî civînên Cenevreyê. Çawa ku di civînên Cenevreyê de, ji ber ku kurd li derve hatibûn hiştin; civîn felişîbûn. Ji bo civîna Astanê yê jî heke kurd neyên vexwendin -hêj nehatine vexwendin- ew ê encam neguhere. Jixwe çend komên Artêşa Azad a Sûriyeyê xwe ji civînê vekişandiye.

Li aliyê din şerê li Sûriyeyê yê ku heta pêrar jî şerê wekaletê bû û li ser navê hegemonên mezin, çete û aktorên herêmî êrîşî gel û baweriyan dikirin, ji par ve aktorên esasî êdî li qadê çek li hev kişandine. Li aliyekî Amerîka û Yekitiya Ewropayê ku gelek pasîf man û li aliyê din jî bloka Rûsya û Îranê.

Amerîkayê heta demekê di ser hûsiyên Yemenê re xwest Îran û pê re Rûsyayê mijûl bike lê hesabên wê li hev derneketin. Muxalîfên ku ji aliyê Amerîkayê ve dihatin bikaranîn, nekarî Esad ji ser text daxin. Lê hesabên Rûsyayê yên li ser Esad jî li hev derneketin ku îro roj rabûye dibêje di hilbijartinên pêş de dê Esad nebe namzed.

Di girêka hanê de Tirkiyeyê destpêkê partnerî bi Amerîkayê re kir. Heta ji bo ku Amerîkayê bi Rûsyayê re bide şerkirin hin plangerî jî kirin. Rabû balafira rûsî xist, bi rêya MÎT'ê û hêzên taybet li Sûriyeyê daxilî şer bû, filan û bêvan. Bes hem hilbijartinên li Amerîkayê û hem jî polîtîkayên Obama yên li ser Rojhilata Navîn kirin ku Tirkiye patika xwe bixurîne.

Tirkiyeyê piştre partner guhert û xwe avêt hembêza hirça fêlbaz ango Rûsyayê. Rabû behsa tevlîbûna bazara Şangayê kir. Li gel aboriya xwe ya têkçûyî tawîzên ekonomîk dan Rûsyayê. Ji bo turîstên rûs rabûn qurban dan serjêkirin. Bi rêya neteweperestên tirk ên wekî Dogu Perînçek û Îlker Başbugan bi Esad re têkilî danîn û hwd. Ev hemû ji bo ku kurd nebin xwedî statu kirin û hê jî ji bo vê di nav lêgerînan de ye. Kurdan di nav vê demê de çi kir? Kurdan li Rojava bi gel û baweriyên din re Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê bi pêş xist. Di çarçoveya paradigmaya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a 'Neteweya Demokratîk' de reçeteya bêwatebûna şer danî holê û bûn kakilê Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn.

Di warê bîrdozî û fîzîkî de ji aliyê hêzên herêmî ve ev reçete tê hedefgirtin. Ji ber ku hegemonên demê hem Sûriye, hem jî Tirkiye beriya 100 salan li ser esasên netewedewletê dan avakirin. Tiştê ku li Cenevreyê nehat dîtin ew bû ku êdî dewrana netewedewletên li herêmê bi dawî bûye. Heke Astana jî vê nebîne, ev girêk dê venebe.

Ya ku Amerîkayê dike Amerîka federatîfî ye. Ya ku îro roj Rûsya kiriye hêzeke mezin jî naskirina mafên welatên ji YKSS'ê veqetiyane. Dibe ku îro kapîtalîzm wan ji bingeha wan ve dikoje lê modela Rojava ji bo wan jî derman e. Girêk encax wisa dikare were vekirin.

# Artêşa tirk li pey provakasyonan e



Navenda Ragihandina YPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku sê helîkopterên ku tê tehmînkirin ên artêşa tirk in, di şeva 3'yê çileyê de derbasî Rojava bûne.

YPG'ê diyar kir ku êrîşên artêşa tirk a dagirker ên li dijî Rojava didomin û ev tişt parve kirin: "Leşkerên artêşa tirk di 3'yê çileyê de ji herêma Zerbê ya nêzî gundê Zorava yê Tirbespiyê, hewl da ji sînor derbas bibin û axa Rojava dagir bikin. Artêşa tirk beriya niha jî ji heman herêmê 2 caran xwest ku ji sînor derbas bibe. Li ser bersiva hêzên me leşkerek hat kuştin û leşker paşve çûn. Di heman şevê de 3 helîkopterên ku tê tehmînkirin ên artêşa tirk in, derbasî axa Rojava bûn. Yek ji wan helîkopteran bejahiya gundê Tahûnê yê girêdayî Til Elo ya Girkê Legê bêserûber gulebaran kir. Piştî êrîşê jî her 3 helîkopter ji milê Til Koçer ve firîn û ji Rojava derketin."

Meclisa Sûriyeya Demorkatîk (MSD) jî têkildarî mijarê daxuyaniyek weşand û destwerdana Tirkiyeyê şermezar kir. MSD'ê civîna Astanaye bi bîr xist û got ku Tirkiye di dema agirbestê de êrîşên provakatîf dike. Daxuyanî wiha bi dawî bû: "Bi vê yekê xuya dibe ku gelek planên dagirkeriyê yên Tirkiyeyê hene. Em li dijî van êrîşan bê deng namînin û dê bersivê bidin." QAMIŞLO - ANHA

# Çîroka zarokekê bêguneh

**Çeteyên DAIŞ'ê di serî de zarokê wê yê bêguneh ji bînayê avêt û piştre got ku zarok bê guneh bû. Dayik jî êşa xwe wiha tîne ziman: "Wan dilê min parçe parçe kir. Xwedê cenazeyên wan bi kûçikan bide xwarin."**

SEYÎT EVRAN / MINBIC - ANF

Çeteyên DAIŞ'ê zarokê bi navê Mehmet ê 13 salî piştî ku bi mehan di girtîgehê de dihêlin, ji bînayekê diavêjin û qetil dikin. Dayika Mehmet Sebîha jî bi dilekî êşiyayî wiha dibêje: "Wan dilê min parçe parçe kir. Xwedê êşeke 10 qat mezintir bide wan."

Minbic, demeke dirêj di bi bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de ma. Di vê demê de bi hezaran kesên bêguneh hatin qetilkirin, tecawîzkirin û işkence kirin. Yek ji van welatiyan jî dayika Sebîha Mustefa ye. Sebîha (50) tevî 4 keç û 2 kurên xwe li Minbicê di jiyan û serpêhatiya xwe wiha parve dike: "Kurê min di kargehekê de di xebitî. Rojekê çeteyek hat û Mehmet pirsî. Piştî lêgerîna malê jî derketin."



**ZAROKÎ DIGIRIN**

Dayika Sebîha got ku bi çûyîna çeteyan kurê wê Enes vedigere û bûyerê wiha rave dike: "Di heman wextê de jî Mehmet kete hundir. Min got Mehmet 'te çi kiriye'. Lê sond xwar ku tiştek nekiriye. Piştre me zanî ku kurê xwediyê kargeha Mehmet, bi derewa 'Mehmed destdirêjî kiriye' hatiye girtin. Bi heman piştre çeteyan hêlan ku ez bi Mehmed bibînim."

**ZAROK DILERIZÎ**

Dayika Sebîha hovîtiya çeteyan bi van gotinan vegot: "Rojekê destûr dan û ez çûm zindanê. Min kurê xwe pirsî û gotin nimêj dike. Piştî nimêjê hat, xwe avête sukra min û bi lerizîn digiriya. Celadek li piştmin bi awayekê ku Mehmet bibîne li nîvê dêrî sekinîbû. Dema ku zarok çav bi wî ketibû, diricifî û ji girî dixeniqî. Por û rihên wî tevlihevbû, ji devê wî girêz dihat û bi qebhî dibeşişî. Ne weke mirovan bû û çavçirayî bû. Her devera wî di nav gemarê de bû. Çi ji zarok re gotiye an jî kiriye nizanim. Min dizanî ger kurê min rizgar jî bibe, wê ji tirsa bimire."

**MEHMET KUŞTIN**

Çîroka Mehmetê biçûk wiha didome: "Me ji bavê kurikê din re got ku em kurê te bibin nexweşxaneyê û bila rastî diyar bibe. Lê got kurê wî ne li malê ye. Piştre jî çeteyan bi hinceta ku me ji wan bawer nekiriye, ser mala me de girtin. Di rojekê îne de hatin deriyê me xistin û hevjînê min pirsîn. Gotin ku em ê Mehmet berdin û îmzeya wî lazime. Ez ewqas bi vê gotinê kêfxweş bûm ku nayê tarîf kirin. Lê min lê nêrî ku Enes pora xwe dikişkişand. Min got te xêre? Got ku 'dayê dayê Mehmet kuştine.' Ez ji ser hişê xwe çûm."

**EDALETA DERENG**

Trajediya malbatê li vir jî naqede. Dayikê da zanîn ku piştî ku kurê wê bidarve dikin, bedenê wî yê biçûk parçe parçe dikin û wiha pê de çû: "Piştî vê hovîtiyê, serokên dadgeha 'şerîetê' gotin ku biryara şaş hatiye girtin û zarok bêgunehe. Ev jî çîroka kurê min ê bêguneh e."

**QÊRÎNA DAYIKÊ**

Herî dawî jî dayika Sebîha êşa xwe wiha tîne ziman: "Êdî xew bi çavên min nakeve. Her dema ku deng ji dêrî tê ber bi dêrî ve dibezim. Ez hê jî dibêjim qey kurê min wê were. Ez vê çîrokê ji herkesî re dibêjim û ku vê êşê bizanin. Kurê min ê bêguneh û pepûk ji bînahiyê avêtin û laşê wî hûr hûr kirin. Wan çawa agir bi dilê min xistibe, xwedê jî 10 caran agireke mezintir bi dilê wan bixe. Bila ax laşê wan qebûl neke. Bila li kuçeyan bimîne laşê wan, gur û kûçik bixwin."



## HSD berxwedana mirovahiyê dide

Şervanên Tugaya Siqûr El Reqqa ên destnîşan kir ku armanca wan a sereke rizgarkirina gelê herêmê ji zilma çeteyan e û soz da ku dê di demeke nêz de tevahiya Reqqayê rizgar bikin.

Şervanê bi navê Welîd Abdullah anî ziman ku ew ji bo tolhildana gelê xwe ji çeteyên DAIŞ'ê tevlî hemleya Xezeba Firatê û wiha domand: "Çeteyên DAIŞ'ê sê pismamên min kuştin. Jiyan li me tarî kirin. Heta rizgariya axa xwe em ê şer bikin." Şervanê bi navê Abdulxefûr El Hendawî jî got ku çete yên DAIŞ'ê di bin navê îslamê de welatê wan talan dikin û mirovan qetil dikin. Fermandarê Lîwai Siqûr Reqqa Ebû Mistefa jî da zanîn ku çeteyan du birayên wî kuştine û wiha got: "Kiryarên herî hovane bi serê gel anîn. Em di dojehê de hiştibûn. HSD parastina hemû gelan dike û berxwedana mirovahiyê dide. Min jî xwest li gel wan têbikoşim. Ez bang li gelê Reqqayê dikim ku ji komên çete dûr bikevin." REQQA - ANHA



## Dewleta tirk komkujiyeke din pêk anî

Artêşa tirk a dagirker li herêma Babê komkujiyeke din pêk anî. Di encama komkujya artêşa tirk de bi qasî hatiye zelalkirin, 11 sivîlên ku 3 ji wan ji heman malbatê ne, hatin qetilkirin.

Balafirên artêşa tirk ji sibêha 3'yê kanûnê heta demên êvarê, navend û gundewarên Babê bi dijwarî bombebaran kir. Hat zanîn ku di encama bombebaranê d 3 jê ji heman malbatê 11 sivîl hatin qetilkirin. Navên sê welatiyên ji heman malbatê wiha ne: "Husên Ehmed El Salih El Xelo, Mehmûd Ehmed Hecî Mehmûd Xelo û Enwer Xelîl Ehmed El Salih Xelo." Çavkaniyên ji herêmê dan zanîn ku artêşa tirk bi taybetî deverên sivîl lê dimînin bombebaran dikin. Balafirên artêşa tirk di 3'ê kanûnê de êrîşî bajaroka Erîma û gundê Şex Nasir ên Minbicê kiribûn 3 sivîl qetil kiribûn û 14 jî birîndar kiribûn. BAB - ANHA



## Federalî mafên gelan mîsoger dike

Endamê Meclisa Damezirîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Îbrehîm El Hesen diyar kir ku sîstema federal dê mafê hemû pêkhateyan mîsoger bike û hêviyên tirkmenan jî pêk bîne.

Îbrehîm El Hesen destnîşan kir ku federaliya demokratîk mafê hemû gelan pêk tîne û wiha domand: "Dê mafê tirkmenan jî pêk bîne. Civîna duyemîn a meclisa damezirîner gaveke mezin bû û di qada navneteweyî de deng veda. Hevpeymana civakî jî hêvî û daxwaz pêşerojê ya hemû gelan pêk tîne."

El Hesen herî dawî jî wiha got: "Federalî çavkaniya çareseriya aloziya Sûriyeyê ye. Em weke tirkmenan di zanîn ku federaliya demokratîk mîsogeriya mafê hemû gelan e. Hevpeymana civakî encama vîn û têkoşîna gelan bû. Federalî yekitiya hemû gelan ava dike." GIRÊ SPÎ - ANHA






## Tirkiye penaberan jehrî dike

Çavkaniyên ji kampa Şemmarîn a Tirkiyeyê ku welatiyên sûriyeyî lê hatine bicihkirin, da zanîn ku di roja sêşemê de piştî ku şîrê li kampê hatiye belavkirin, 253 welatî jehrî bûne. Çavkaniyan daxuyand ku tevî ku dîroka bikaranîna şîr derbas nebûye jî bi sedan welatî jehrî bûne. Çavkaniyan teqez kir ku şêwaza jehrîkirina şîr bi rêya xistina madeyên jehrî a bi derziyan pêk hatiye. Wekî tê zanîn dewleta tirk penaberên sûrî li hemberî dewletên ewropî wek gefekê bi kar tîne. EZAZ



## Di deriyê Idlibê de cebilxane hat girtin

Kamyoneke bi cebilxaneyê barkirî û di cihên nediyar de hatibû veşartin, hewl da ji bejahiya di Kantona Efrînê re derbasî bejahiya Ezazê bibe. Hêzên Asayîşê kamyon û cebilxaneya tê de desteser kirin. Têkildarê mijarê Buroya Navenda Ragihandina Asayîşê destnîşan kir ku cebilxaneya ku hatiye desteserkirin 5 hezar fîşekên BKC tê de hebûn. Buroyê da zanîn ku ajokarê kamyonê hat girtin û radestî cihên peywendîdar hat kirin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku hêzên Asayîşê ji par heta niha gelek cebilxane desteser kirin. EFRÎN



## Rojava bû stargeha penaberên iraqî

Bi destpêkirina pêngava duyemîn a rizgarkirina Mûsilê pêla penaberên Iraqê ber bi rojavayê Kurdistanê ve zêde bû. Di sê rojên dawîn de 293 penaber ango 81 malbatên iraqî gihaştin kampa Holê. Rêveberiya kampa Holê da zanîn ku hejmara penaberên Iraqê li kampê zêde bûye û heta niha saziyên navneteweyî û mirovî tu destek nedan penaberên Iraqê. Rêveberiya kampê da xuyakirin ku ew li gorî derfetên xwe alîkariyê didin penaberan lê ev yek têrê nake. HESEKÊ



## Şaredariya Gel rêyan sererast dike

Di encama rewşa xirab a hewayê de û tunebûna madeyên sereke yên qîrkirina rêyan, hin rêyên sereke û rêyên şaxî xirabe bûne. Şaredariya Gel a navçeya Cindirêsê jî kortên rêyan û di nav de kortên rêya bazara navçeyê bi madeya çîmentoyê sererast kir. Her wiha Komîteya Pêjiyanî ya girêdayî Şaredariya Gel a Cindirêsê jî xebatên xwe yên çavdêriya madeyên bikaranînê, didomîne. Di vê çarçoveyê de komîteyê miqdarek ji madeyên dembihurî û xirabe desteser kirin û li pêşiya avahiya şaredariyê avêtin çopê. EFRÎN

# Li şûna îstîfa bikin OHAL dirêj kirin

**Nûnerên partiyên siyasî yên dijberî OHAL'ê ne li hemberî daxuyaniyên ku ji aliyê rayedarên hikumetê ve ji bo dirêjkirina OHAL'ê hat dayîn, nerazîbûn nîşan dan û diyar kir ku hikumet li şûna ku îstîfa bike OHAL'ê dirêj dike**




Rêxistinên ku ji bo OHAL bê rakirin kampanyayê didin meşandin nirxandina "Hikumeta ku berpirsyara pêvajoyê ye li şûna îstifa bike di nava lêgerîna dirêjkirina OHAL'ê de ye" kir.

Seroka Giştî ya EMEP'ê Selma Gurkan a ku piştî OHAL hat îlankirin heta niha li qadan xebatên agahdarkirinê dide meşandin, wiha axivî: "Di pêvajoya borî de bi taybetî jî di 6 mehên dawîn de dema ku em rewşê tînin ber çavan, aşkera ye ku OHAL pêşiya êrîşên terorê nagire yan jî ji bo ewlehiya welat, pêkanîna demokrasiyê tu rola wê tune ye. OHAL tenê îqtîdara AKP'ê ji bo îqtîdara xwe mîsoger bike bingeha siyasî ava dike." Gurkan destnîşan kir ku dê li dijî OHAL'ê kampanyaya xwe bidomînin.

Endama DÎB'ê parlamentera berê ya CHP'ê Bînnaz Toprak jî diyar kir ku OHAL hatiye derxistin heta niha tu pirsgirêk çareser nekirine û wiha berdewam kir: "Rewşa Tirkiyeyê îro bi rastî jî ne baş e. Tişta ku pêdiviya Tirkiyeyê heye lihevkirina siyasetmedaran e û ji bo welat dikare çi bê kirin divê biryar bê dayîn." Toprak anî ziman ku divê ji sîstema serokdewletiyê vegerin.

Serokê Partiya Şoreşger Ufuk Gollu jî anî ziman OHAL li dijî kurdan û jinan hatiye derxistin û wiha got: "Ji bo torên cînayetê yên selefî OHAL tune ye. Ew rehet dikarin tev bigerin. Divê hêzên ked, demokrasî û azadiyê li dijî OHAL'ê têkoşînê xurt bikin. Di van şertan de hikumeta ku berpirsyara pêvajoyê ye li şûna îstîfa bike hewl dide ku OHAL'ê dirêj bike."

Seroka Giştî ya ESP'ê Çîçek Otlu jî diyar kir ku piştî îlankirina OHAL'ê AKP'ê xwestiye peyamê bide muxalefetê û wiha berdewam kir: "Dixwazin sîstema serokdewletiyê bi rehetî bixin meriyetê. Li dijî jiyana ku AKP qebûl nake diyar e dê çanda lîncê pêk bê. Dixwazin bêyî HDP'ê referandûmê pêk bînin. Ji ber vê yekê jî dixwazin bi dirêjkirina OHAL'ê me ji kolanan dûr bixin lê em ê kolanan neterikînin."

*STENBOL - DÎHABER*

## Li Rihayê 13 kes hatin girtin

**RIHA** – Li navçeya Beşiktaşê ya Stenbolê piştî di 10'ê kanûnê de li dijî hêzên çevîk êrîş pêk hat û piştî êrîşê bi fermana Wezîrê Karên Hundir li Rihayê li dijî endam û rêveberên HDP û DBP operasyon pêk hat û 250 kes hatin binçavkirin. Ji 250 kesên hatin binçavkirin bi rojane li Salona Sporê dihatin rawestandin û piştî 22 rojan jê 39 kes sewqî dozgeriyê kirin. Ji 39 kesan 13 kes hatin girtin û 26 kes serbest hatin berdan.

## Piştî 23 rojan şandin dadgehê

**STENBOL** – Piştî 10'ê Kanûna 2016'an êrîşa bombeyî ya li Beşiktaşa Stenbolê gelek endam û rêvebirên HDP'ê hatin binçavkirin û duh sewqî dadgeha Buyukçekmece ya li Çaglayanê hatin kirin. Hat zanîn ku HDP'iyên ev 23 rojin di binçavan de ne li midûryeta polîsan a TEM'ê ya li ser kolana Vatanê û ya Esenlerê di dema parastinê de mafê xwe yê neaxaftinê bikar anîne.

## Li Hatayê 2 kes hatin binçavkirin

**HATAY** – Li navçeya Îskenderûnê ya Hatayê polîsan bi ser malan de girt û xwendekarên bi navê Enver Alan û Şefik Tabanli hatin binçavkirin. 2 kesên sedema binçavkirina wan nehat zanîn birin midûriyeta polîsan. Li Hatayê ji 28'ê kanûnê heta niha 15 kes hatibûn binçavkirin. 15 kes 8 roj in di bin çavan de ne.

## 'Bila Yildirim serbest bê berdan'

**ENQERE** – Rêveberê Sendîkaya Kedkarên buro (BES) Civan Yildirim di 22'ê Kanûna 2016'an de li ser îxbarekê hat girtin. Yildirim ji ber nexweşiya xwe divê bi cîhazan bê dermankirin. Sekreterê Giştî yê BES'ê Davut Balikçi û Parêzera wî Duygu Demirel, têkildarî rewşa Yildirim daxuyanî dan diyar kirin ku li gel nexweşiyê pêwiste bi cîhazê tibbî bijî û xwestin Yildirim serbest bê berdan.

## Parlamenter Bîrlîk serbest hat berdan

**ŞIRNEX** – 1'emîn rûniştina doza Parlamentera HDP'ê ya Şirnexê Leyla Bîrlîk ku li ser fermana Dozgerê Komarê ya Şirnexê di 4'ê mijdarê de hat girtin, li 2'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Şirnexê hat dîtin. Bîrlîk ku li Girtîgeha Sîlîvriyê dihat girtin, bi riya Dîmen û deng (SEGBÎS) beşdarî rûniştinê bû. Leyla Bîrlîk bi şertê kontrola edlî û qedexeya derveyî welat serbest hat berdan.

## Dê bibe qanûna derbeyê

Parlamenetera HDP'ê ya Êlihê Ayşe Acar Başaran a li ser navê partiya xwe di Komîsyona Qanûna Bingehîn de cih digire, hem xebatên komîsyonê hem jî guherînên qanûna bingehîn ên ku AKP û MHP li ser li hev kirine, nirxand.



Ayşe Acar Başaran destnîşan kir ku, di dengdayîna ku dê hefteya bê pêk bê de, wê teqez pakêta qanûna bingehîn derbas nebe û wiha got: "Lê ji bo parlamenterên xwe têxin bin çewsanê, wê her partî komîserên xwe deyne ser serê parlamenteran û wê dengdayîn wisa pêk bê." Başaran destnîşan kir ku, piraniya parlamenterên pêşnûme îmze kirine, îmze avêtine kaxiza vala û nizanin di wê guherînê de çi heye û wiha axivî: "Îmze avêtin kaxizên vala û li ser madeyan tenê ev gotin, 'Xetereya dabeşkirina Tirkiyeyê heye. Li welat bêistikrariyek heye.' Çareseriya vê jî tenê di pergala serokatiyê de dibînin."

Başaran diyar kir ku heke pakêta qanûna bingehîn a behsa wê tê kirin dikeve meriyetê wê dîktatoriyek xwe bide der û wiha got: "Wê ev dîktator alîgirên xwe yên serok hilbijêre, wê wezîrên xwe hilbijêre, yanî hema bêje wê hikûmet ew be. Wê bi vê pergalê re meclis û hikumet bi temamî bê pelaştin. Wê hemû raye di dest serokê dewletê de bin. Hemû rayeyên welat li ber însafa mirovekî dihêlin. Dê bi pergala serokdewletiyê tu wateya hilbijartinan nemîne." Başaran anî ziman ku hemû qanûnên bingehîn ên piştî 1924'an tev yên derbeyê ne û qanûna bingehîna a 2017'an tê çêkirin jî ya derbeyê ye. Başaran da zanîn ku dê li dijî rejîma dîktatoriyê têkoşîna xwe bidomînin.

*ÊLIH - DÎHABER*

## Bi belgeya sexte OHAL dirêj kirin

**Hikumeta AKP'ê Rewşa Awarte (OHAL) 3 mehên din jî dirêj kir. HDP'ê îdia kir ku di belgeya ku hikumetê ji bo dirêjkirina OHAL'ê daye, sextekarî hatiye kirin.**

**Di belgeya ku HDP'ê li meclisê anî rojevê de hat gotin ku ji bo dirêjkirina OHAL'ê di 3'yê çileyê de Civîna Ewlehiya Neteweyî (MGK) biryara tavsiyeyê hatiye dayîn û Lijneya Wezîran jî li gorî vê yekê xwestiye OHAL'ê dirêj bike. Parlamenterên HDP'ê der barê belgeyê de ji hikumet û serokatiya meclisê daxuyanî xwest. ENQERE**



## Seydî Firat: Dê têk biçin

Endamê Desteya Rêveberiya Navendî ya Partiya Herêmên Demokratîk Seydî Firat, ji girtîgehê peyamek şand.

Firat bi rêya parêzerê xwe peyam şand û wiha got: "Xwestin em tev li qada siyasetê bibin. Em jî, ji bo xurtkirina pêvajoya aştiyê û çareseriya siyasî ya pirsgirêka kurd, di sala 1999'an de wek koma aştiyê hatin Tirkiyeyê. Lê belê ji wê rojê heta îro, li pêşberî daxwazên me yên aştî û siyasî her tim girtîgeh li me hat ferzkirin. Yên daxwazên me yên aştî û siyasî ji nedîtî ve tê tengav bûne û serî li rêbaza cezakirinê dide. Yê winda bikin jî ew in." *AMED*

## Îşkence li hevşaredar kirin

Li Rihayê kesên ku di operasyonên qirkirina siyasî de hatin binçavkirin, li şaxa TEM'ê û salona sporê ya Şaredariya Halîliye ya AKP'yî tên girtin.

Di nava binçavkiriyan de hevserokên HDP û DBP'ê yên bajar û navçeyên Rihayê, endamên Meclîsa Partiyê, hevşaredarên Wêranşar û Hewengê yên DBP'yî, nûnerên rêxistinên civaka sivîl, parêzer û rêveberên partiyê jî hene. Li gorî agahiyên, bi rengekî rêk û pêk îşkence li binçavkiriyan tê kirin.

Derket holê ku polîsên tirk ji Hevşaredar Emrullah Cîn re gotine; 'Em ê bi te re baxivin', ew derxistine derve û li derve îşkence lê kirine. Mirovên li vê derê îşkence li wan tê kirin, ranakin nexweşxaneyê.

*RIHA*

## Qeyûm pêşnûme asteng kir

**Jinên li atolyeya hunerên destan a girêdayî Navenda Şêwirmendiyê ya Jinan a Berfînê di bin banê Şaredariya Sêrtê de xebatên xwe dimeşandin.**

**Atolyeyê ku 3 sal e bi awayekî çalak xebatên xwe dimeşandin, 12 jin lê dixebitîn û li vê atolyeyê, berên dekoratîfî yên li malan tên bikaranîn, berên pitikan, boxçe, rûber û hwd. dihatin çêkirin. Atolye di nava hefteyê de dixebitî, 15 kursiyerên wê hebûn û berên cuda dihatin çêkirin. Piştî ku Hevşaredarê Sêrtê Tuncer Bakirhan ji peywirê hat girtin û li şûna wî qeyûm hat tayînkirin, pêşnûmeyên atolyeya jinan hatin astengkirin. SÊRT**

## Gotinên Erdogan li hev nakin

Serokomarê tirk Tayyip Erdogan di 33'emîn civîna bi keyayan re li ser Babê axivî.

Artêşa tirk li Babê derbên giran dixwe û dewleta tirk rastiyan ji raya giştî vedişêre. Erdogan di 23'yê Kanûnê de li Îzmîrê têkildarî Babê got "El Bab di bin dorpêçê de ye. Qediya diqede". Erdogan, di axaftina xwe ya duh bi keyayan re jî got: "Înşallah dê operasyona Babê di demeke kin de xelas bibe." *ENQERE*

www.arsivakurd.org

# 237 hefte ne ji bo Ocalan nobeda azadiyê digirin




Çalakiya nobedê ya li bajarê Strasboûrg ê Fransayê, ku ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û hemû girtiyên siyasî tê lidarxistin di hefteya 237'emîn de ye. Nobed her hefte ji aliyê kurdistaniyên ji bajarekî ve li Ewropayê tê meşandin.

Heta niha bi sed hezaran belavok û broşur hatine belavkirin. Her wiha bi rengekî devkî agahî ji deh hezaran kesî re hatiye dayîn. Kurdistaniyên bi navê Meryem Laçin, Bahattîn Kaplan, Medenî Apaydin û Sarûhan Akad ên ji bajarê Kassel ê Almanyayê hatin, nobeda vê hefteyê digirin.

Endamên koma ji Kasselê, ku ji roja Yekşemê ve nobedê digirin, da xuyakirin ku ew esareta Ocalan qebûl nakin, lewma tev li çalakiya nobedê bûne. Çalakgeran bang li Konseya Ewropayê, Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê û Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê ya Konseya Ewropayê kir ku ji bo lêkolînkirina şert û mercên Ocalan bi lezgînî bikevin nav hewldanan. STRASBOÛRG - ANF

# Pêşmerge li gel gerîla ne

**Nêzî 200 Pêşmergeyên Dêrîn, li dijî îdiayên dewleta tirk ên dagirkirina başûrê Kurdistanê daxuyanî da. Pêşmergeyan diyar kir ku heke operasyon çêbe dê li hemberî dewleta tirk şer bikin û piştgiriyê bidin gerîla**

Nêzî 200 Pêşmergeyên Dêrîn ku bi çekên xwe hatin Qendîlê, daxuyanî dan. Pêşmergeyan diyar kir ku ji bo wan Qendîl û Şengal xetên sor in.

'Pêşmergeyî Derîn', navek e ku li pêşmergeyên YNK'ê hatiye kirin, ku ev pêşmerge beriya Şerê Kendavê yê sala 1992'an li Başûrê Kurdistanê tê dikoşiyan. Li ser navê Pêşmergeyên Dêrîn Omer Hecî Husen wiha axivî û wiha got: "Em dizanin, dewleta tirk hêzên navdewletî jî digire cem xwe û ketiye nav êrîşeke nû ya li dijî destkeftiyên gelê Kurdistanê. Wek Pêşmergeyên Dêrîn, em ê nehêlin şerê birakujiyê çêbe. Em bang li her kesî dikin ku li beramberî van lîstokan hişyar bin. Ketina dewleta tirk a başûrê Kurdistanê, em wek dagirkirina başûrê Kurdistanê û êrîşa tunekirina destkeftiyan dinirxînin. Pêwîst e, partiyên siyasî yên başûrê Kurdistanê bangên KCK'ê li ber çavan bigirin. Ev bang, berjewendiyên tevahiya gelê Kurdistanê dihewîne. Em Serokê Hikumeta Başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî rexne dikin. Divê bangên wisa neke. Bi taybet jî ew daxuyaniyên Barzanî yên dibêje gerîla ji Şengalê derkeve, tenê kêfa hêzên dagirker tîne, ji bilî wê tu tiştî li gelê kurd zêde nake. Yên ku gelê Şengalê ji qetlîamê rizgar kir, gerîla bûn."

êşmergeyên ku tevli daxuyanî bûn der barê daxuyaniya dîrokî ji ANF'ê re axivîn.

Pêşmergeyan dan xuyakirin ku êrîşên li dijî gerîla û zexta derketina ji Şengalê, daxwaz û hewldanên dewleta tirk e û wiha gotin,: "Hûn kê ji mala kê diqewirînin?" Pêşmergeyan gotin dê heta dilopa dawî ya xwîna xwe bi gerîla re bin.

Selîm Sadik Ehmed da xuyakirin, wan xwest nîşan bidin ku li ku derê pêwîstiya gerîla bi piştgiriyê hebe ew amade ne û wiha got: "Gefên 'bila PKK Qendîlê vala bike' bi kêrî tiştekî nayên. Qendîl jî Şengal jî axa Kurdistanê ne. Çima gerîla ji vê derê derkeve? Ev daxwaz daxwaza dijmin e ku dixwaze careke din Kurdistanê dagir bike."

**ÊRÎŞÊ QEBÛL NAKIN**

Pêşmergeyê bi navê Mam Şivan jî wiha got: "Dixwazim vê bêjim û bila Erdogan vê baş zanibe: Êrîşa li dijî Qendîlê xeta me ya sor e. Em ê bi tu awayî vê qebûl nekin û bêdeng nemînin. Li Bakur gelê me dikuje û êrîşî Rojava dike. Lazim e em hemû bi berpirsyarî rabin û li dijî vê derkevin. Armanca hatina me ya li vê derê ew e, me xwest nîşan bidin ku em bi gerîla re ne." Emîn Osman Mihemed da xuyakirin, ku daxwaza 'bila gerîla ji filan cihî derkeve' zexta dewleta tirk e û wiha got: "Qebûlkirina vê yekê tê wateya parvekirina mal û milkên xwe bi dijmin re." *QENDÎL - ANF*






## 'Dê dîrok rehmê li wan neke'

Endamê Komîteya Partiya Demorkatîk a Sûriyê Gêlo Îsa bal kişand ser banga KCK'ê ya lidarxistina Kongreya Netewî û wiha axivî: "Partiya me jî li benda geveke bi vî rengî ye. Em amade ne çi ji bo lidarxistina Kongeriya Netewî ya Kurdistanê bikeve ser milê me em pêk bînin."

Gêlo Îsa, anî ziman ku divê hemû alî nakokiyên xwe bidin aliyekî û ji bo yekitiyê bikevin nav hewldanan û wiha axivî: "Parçebûna di nava tevger û partiyên kurd de di xizmeta dijminên gelê kurd de ne. Dîrok dê rehmê li kesên li ber lidarxistina Kongereya Netewî dibin asteng neke." Îsa di dawiya axafitna xwe bang li hemû hêzên Kurd ên siyasî û leşkerî kir ku piştgirî bidin lidarxistina kongreyê. *KOBANÊ*



# Kongre pêwîstiya demê ye

HÊLAN CELAL / GIRKÊ LEGÊ - ANHA

Li Girkê Legê siyasetmedarên kurd daxwaza lidarxistina Kongreya Netewî ya Kurdistanê kir û got ku pêwîst e lêvegera siyasî ya gelê kurd were avakirin.

Endamê Komîteya Partiya Demorkatîk a Pêşverû ya Kurd li Sûriyeyê Idrîs Çaçan got ku lidarxistina kongreya netewî ya Kurdistanê pêwîstiyeke demê ye û divê gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê piştgiriya lidarxistina Kongreya Netewî ya Kurdistanê bike û got: "Li Rojhilata Navîn û bi taybet li Sûriyê rewşeke nû heye. Di vê demê de pêwîst e gelê kurd kongreya netewî ya Kurdistanê li dar bixe."

Sekreterê partiya Niştimanî ya Kurdistanê Şefîq Îbrehîm jî bang li hemû partiyên kurd kir ku ji bo lidarxistina kongreya netewî ya Kurdistanê lez bidin kar û xebatên xwe. Îbrahîm bal kişand ser geşedanên li herêmê diqewimin û wiha got: "Ji destpêka şoreşa Sûriyeyê û heta niha gelek alî destwerdanê di herêmê de dikin û di serî de dewleta tirk, Qeter û Erebistana Siûdiyê. Bi destwerdana xwe dixwazin siysasetên xwe di herêmê de bimeşînin û ji ber vê yekê gelekê êrîşî gelê kurd kirin. Lê gelê kurd li Rojava li dijî hemû hewlanên wan siyaseteke rast meşand û Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ava kir, niha jî ber bi fedraliya demorkatîk ve diçin. Ji bo parstina van destkeftiyan dive gelê kurd yekîtiya xwe ava bike, ev jî bi lidarxistina Kongreya Netewî pêk tê." Îbrehîm girîngiya lidarxistina kongreyê wiha anî ziman: "Dîrok di vê sedsalê de careke din xwe dubare dike. Tifaq û peymanên di navbera gelek aliyan de têne kirin, ji ber vê yekê pêwîste gelê kurd yekitiya xwe ava bikin, da ku berjewendiyên xwe yên heyî biparêzin."

Îbrehîm destnîşan kir ku partiya wan bi hemû hêza xwe piştgiriya lidarxistina kongreya neteweyî ya Kurdistanê dike.



Şefîq Îbrehîm



Idrîs Çaçan

## KODAR'ê Îran hişyar kir

Civaka Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KODAR) bi wesîleya sala nû daxuyaniyeke nivîskî weşand. KODAR'ê bal kişand ser guhertinên li herêmê dibin û destnîşan kir, eger Îran xwe nede ber çareseriya pirsgirêka kurd, wê nikaribe qeyranan ji sînorên xwe dûr bike.

Di daxuyaniyê de hat ragihandin, mekanîzmayên zext û zordariyê yên rejîma Îranê di sala bihurî de jî weke berê dewam kir û zêdekirian hejmara cerdevanan, operasyonên leşkerî yên li dijî gerîla û zêdekirina aboriya şer hat bibîrxistin.

KODAR'ê bal kişand ser êrîşên li dijî Yekîneyên Parastinê yên Rojhilatê Kurdistanê (YRK) û da zanîn, tevî ku YRK nexwest bikeve nava şer jî, li dijî êrîşan mafê xwe yê parastinê bi kar tîne û eger rewş bi vî rengî dewam bike, wê ev mafê rewa ji xwe bê bikaranîn.

## Bi yekitiyê bersivê bidin

Di 8'ê kanûna 2016'an de KCK'ê bang li partiyên siyasî yên Kurdistanê kiribû ku di vê qonaxê de kongreya neteweyî li dar bixin.

Sekretera Giştî ya Partiya Yekitiya Lîberal a Kurdistanê Ebîr Hesaf diyar kir ku li hemberî êrîşên dijminê kurdan pêwîst bi yekitî û hevgirtinê heye. Ebîr wiha axivî: "Pêwîst e her kes xwe li ber selamet û aramiya Kurdistanê berpirsyar bibîne û erka xwe pêk bîne. Pêwîst e ji niha ve ew kes ji bo yekitiya gelê kurd ji şaştiyên xwe vegerin û bi hev re kongreyek netewî li dar bixin. Em bang li her kesî dikin ku hêviyên gelê kurd pêk bînin û kongre li dar bixin. Ger nêrîn nebin yek çareserî çênabe, hebûna gelan di bin xetereyeke mezin de ye." *RIMÊLAN*



# Jin li dijî girtina ENSTÎTUYÊ bi bertek in

**BI KHK'YAN** li Tirkiye û bakurê Kurdistanê 94 komele hatin girtin. Di nav komeleyan de Esntîtuya Kurd ya Stenbolê ku bi pêşengiya Musa Anter hat avakirin jî heye. Jinan bertek nîşanî girtina enstîtuyê dan û da zanîn ku dê li her derê zimanê kurdî bidin jiyandin.

Yek ji rêveberên enstîtuyê Semra Ecer anî ziman ku enstîtu ji bo zimanê kurdî xwedî cihekî girîng bû û wiha dom kir: "Zimanê kurdî her tim rastî êrîşan hatiye. Civakeke ew qas rastî pişaftinê hatiye, bi van xebatan hewl dida zimanê kurdî bi pêş ve bibe. Me enstîtu wek mala xwe didît. Me zimanê kurdî li her derê belav dikir û xebatên me hemû li ser ziman bûn. Girtina saziyê li derveyî hiqûqê ye. Di destûra bingehîn a Tirkiyeyê de tiştekî wisa tune ye. Derdikevin derveyî qanûnên xwe."

Xwendekara enstîtuyê Ayten Esen jî bertekên xwe wiha nîşan dan: "Waneyên me di nîvê de hiştin. Em pêkanînên dewletê şermezar dikin. Piştî ku sazî hat girtin jî me perwerdehî berdewam kir û em ê bi saziyên din ên hatine girtin re jî di nav piştevaniyê de bin."

Der barê heman mijarê de xwendekar Elîf Yildirim jî diyar kir ku enstîtu ji bo wan gelekî baş bû û wiha got: "Divê îro hemû gelê me li vir bûya. Ger em hemû bi hev re rabin ser pêyan, em ê bigihîjin encamê. Desthilatdar naxwazin em hînî zimanê xwe bibin. Bi vê polîtîkaya pişaftinê dixwazin bibêjin hûn tune ne."

Xwendekara enstîtuyê Yasemîn Babatkayan jî girtin şermezar kir û anî ziman ku kurdî di jiyana wan de cihekî girîng digire.

STENBOL – ŞÛJIN




Zana Farqînî û Îbrahîm Halîl Taş anî ziman ku dewlet bi mohrkirina saziyên zimanê kurdî dixwaze xebatên ziman asteng bike û da zanîn ku li dijî vê polîtîkayê her maleke kurdan dikare wek dibistanekê bixebite

# 'Her malek DIBISTANEK'

BÎLAL GULDEM / AMED - DÎHABER

Zimanzan Zana Farqînî da zanîn ku girtina sazî û dezgehên ziman dijqanûnî ne. Hevserokê Akademiya Ehmedê Xanî Îbrahîm Halîl Taş jî anî ziman ku her malek dibistanek e.

Bi riya Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de (KHK), Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ku di 18'ê nîsana 1992'an ji hêla Musa Anter, Feqî Huseyîn Sagniç û gelek rewşenbîrên din ve hat avakirin û Akademiya Ehmedê Xanî ya ku di sibata 2012'an de hatibû avakirin, hatin girtin. Enstîtuya Kurdî û akademî ji wê demê heta niha li ser ziman, wêje, dîrok û hemû beşên ji bo zimanê kurdî xebat didan meşandin. Enstîtû, di nava 25 salan de tevî gelek zext û pêkutiyan jî, di pêşvebirina zimanê kurdî de xebatên girîng meşandin. Her wiha bi hezaran mamoste û xwendekar gihandin û bi sedan pirtûk û ferheng çap kirin û berpêşî xwendevanên zimanê kurdî kirin. Akademiya Ehmedê Xanî jî ji roja avabûna xwe heta niha gelek xebatên girîng li ser ziman û wêjeya kurdî meşandin.

Enstîtû û akademî, di çarçoveya biryarên KHK'ê de di roja dawiya sala 2016'an de hatin mohrkirin. Têkildarî mijarê zimanzan û serokê berê yê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Zana Farqînî û hevserokê Akademiya Ehmedê Xanî Halîl Taş li dijî girtina saziyên zimanê kurdî nerazîbûn nîşan dan.





### ÊRÎŞÊN BÊNAVBER

Zana Farqînî da zanîn ku enstîtu bi armanca xebatên ziman, çand û wêjeya kurdî hat vekirin û ev tişt anî ziman: "Bi saya Apê Mûsa û hemû hevalên wî, enstîtu gihaşt van rojan. Her çend sazî hatibe girtin jî lê em ê ji bo bîranîna navdarên kurd bixebitin û layîqî xebata wan bin. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji roja 18'ê nîsana 1992'an ve heta niha her tim rastî êrîşan hat. Bêtehamuliya li dijî enstîtuyê ango xebatên wê ji wê rojê ve hat nîşandan."

### GIRTIN BÊ HIQÛQÎ YE


Di axaftina xwe de Farqînî da xuyakirin ku bi girtina saziyên kurdan qada siyasî ya xebatan, maf û azadiyan tê astengkirin û wiha pê de çû: "Divê tu dezgehên gel neyên girtin û astengkirin. Aqilmendên hikumet û dewletê zirarê digihînin dewlet, hikumet û gel. Ev sazî xebatên çandî yên kurdî didin meşandin. Çanda gelekî mafê herî sereke ye. Xebatên însanî, hiqûqî û demokratîk in. Di nav civakeke girtî de girtina van saziyan bi tiştekî nayê îzahkirin. Gelo ev bi çi aqil û ferasetê van saziyan digirin? Girtina van sazî û komeleyan bê hiqûqî ye. Ev kes dê di rojên pêş de poşman bibin."

### BÊ KOK DIHÊLIN

Di dawiyê de jî Farqînî bertekên xwe wiha nîşan dan: "Ev girtin û mohrkirin, neçareserî ye. Çareserî di berfirehkirina maf, azadî, mezinkirina sazî û demokrasiyê de ye. Niyeta girtina enstîtuyê û gelek saziyên din ên kurdan, astengkirina xebatên zimanê kurdî ye. Astengiya li pêşiya xwedî derketina ziman e. Dixwazin bi girtina saziyan kurdan bê kok bihêlin û nehêlin kurd li ser pêyên xwe bisekinin."

### TIRSA DEWLETÊ

Îbrahîm Halîl Taş jî daxuyand ku helwesta hikumeta Tirkiyeyê ya li hemberî saziyên kurdan ji roja avabûna Komara Tirkiyeyê heta niha diyar e û got ku êrîşên Tirkiyeyê yên li ser zimanê kurdî bê navber dom kirine. Taş bi lêv kir ku tevî hemû êrîşan jî gelê kurd bi bedelên mezin zimanê xwe parastiye û wiha derbirî: "Ev tirsa li hemberî zimanê kurdî tirsa li dijî dewlemendiya wê ye. Armanca girtina saziyan ew e ku qeyd û bendan li zimanê gelê kurd bixin. Ji dîrokê heta niha dewlet her tim bi feraseta 'yek dewlet, yek al, yek netew û yek ziman' tev geriyaye û dixwaze bi vê polîtîkaya pişaftinê tenê zimanek hebe. Ev nîşana qirkirina zimanê kurdan e. Dixwazin bi girtina saziyên ziman û çandî yên kurdan ziman û çanda wan ji holê rakin. Bi girtina ziman, dixwazin civak û neteweyê ji holê rakin."



### BÊ ALTERNATÎF NÎN IN

Halîl Taş anî ziman ku hişmendiyeke kûr a zimanê kurdî di nav kurdan de çêbûye û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Tu hêz nikare zimanê kurdî qedexe û asteng bike. Tu kes nikare bi darê zorê bayê gur ê zimanê kurdî ji şûn ve bizivirîne. Ev ba li ba bûye. Dibe ku saziyên me yên çand û ziman hatibin girtin lê ew nayê wê wateyê ku kurd dev ji zimanê xwe berdin. Hêviyên me yên geşkirina ziman hin bêtir xurt bûn. Dibe ku mohr li deriyê saziyên me hatibin xistin lê hemû malên kurdan polên dersdayîna ziman, dîrok û wêjeya kurdî ne. Her çi qas saziyên me hatibin girtin jî, em jî bê rêbaz nîn in. Çi qas dewlet bi ser zimanê kurdan de bê, pêwîst e hemû gelê kurd jî xwedî li zimanê xwe derkeve. Lê bila her kes baş bizane ku em ê tu carî hêviyên xwe neşikînin û bê alternatif nebin."

## Bandora enstîtuyê mezin e

**ZANA FARQÎNÎ** da zanîn ku vekirin û hebûna enstîtuyê bandoreke gelekî erênî li ser kurdan kir û enstîtuya kurdî di warê xwe de ji bo pêşvebirina xebatên kurdî bû otorîte. Farqînî da zanîn ku xebatên enstîtuyê wisa hêja bûn ku civak dikare wê qebûl bike û ev nirxandin kir: "Ji wê kevneşopiyê dest bi xebatên xwe kir û heta roja me ya îro dom kir. Vê saziyê di warê ziman û xebatên akademîk de xebatên bêhempa dan meşandin. Şopeke pir giranbuha li dû xwe hişt. Enstîtuyê serkêşiya bi hezaran kesên ku dikarin mamostiya zimanê kurdî bikin, gihand roja me ya îro."



## Nakokiya mezin a dewletê

**ZANA FARQÎNÎ** diyar kir ku bêyî ku lêpirsîn û dozek were vekirin biryara girtina enstîtuyê hatiye dayîn. Farqînî got ku ji ber ku tu xebat û çalakiyên saziyê li wan tu lêpirsîn nehatine vekirin. Farqînî daxuyand ku ji roja enstîtu hatiye vekirin û heta îro tu berhemeke wê nehatiye qedexekirin û doz lê nehatine vekirin û pirsa 'Çima ev sazî hat mohrkirin?' kir. Nakokiya dewletê jî Farqînî bi vê mînaka şênber aşkera kir: "Di dema serdana serokkomarê demê Abdullah Gul a Şaredariya Êlihê û cîgirê serokwezîrê demê Bulent Arinç a Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê de ferhenga min jê re hatibû diyarîkirin. Saziya zimanê tirkî ji bo ferhengeke kurdî û tirkî, ji min ferheng xwest. Lê îro saziya ku ev ferheng derxistine digirin. Hêvîdar im ku di demeke nêz de ev şaşî were serastkirin."

## Elçî û Sûr li dîwarên Osloyê xêz kirin

**SEROKÊ BAROYA AMEDÊ TAHÎR ELÇÎ** yê piştî ku got 'PKK ne rêxistineke terorê ye' bû hedefa faşîstên tirk û dema li dijî êrîşên li ser navçeya Sûrê ya Amedê û Mînareya Çarling daxuyanî dida, ji hêla polîsên tirk ve li ber Mînareya Çarling di 28'ê mijdara 2015'an de hatibû qetilkirin. Polîsên ku Elçî qetil kiri, hêj nehatine darizandin. Lê êrîşên dewleta tirk ên li ser gelê kurd û qetilkirina Elçî hêj tên şermezarkirin. Herî dawî wêneyê ku wehşeta hêzên tirk a li Sûrê vedibêje û ji bo bîranîna Tahîr Elçî li ser dîwarê Navenda Nobelê ya li Osloyê hat xêzkirin. **AMED**



## Xebatên çandê di hedefa koalîsyona sêalî de ne

GOKHAN ONER / DENÎZLÎ - DÎHABER

Li Zanîngeha Pamûkkaleyê ya Denîzliyê, Atolyeya Kîlê ya Civata Çand û Hunerê ya Polenê, di pêşengiya komeke jinên ciwan de hat vekirin. Navenda çandê di hedefa êrîşên nîjadperest de ye û ev êrîşên faşîst ji aliyê rêveberiya zanîngehê, OGB û polîsan ve tê organîzekirin. Atolye her hefte rojên pêncşeman saet di navbera 15.00-18.00'an de li Ay Cafeya li kampusa zanîngehê tê vekirin. Li atolyeyê bi her awayî xebateke kolektîf heye. Komên ji vê xebatê ne rihet dibin, tim kesên beşdarî vê atolyeyê dibin, tacîz dikin.


Xwendekara Zanîngeha Pamukkaleyê Rengîn Çelîk a di xebatên atolyeyê de cih digire, diyar kir ku li Atolyeya Kîlê ji bo hilberînê hemû malzema bi hevkariya xwendekarên zanîngehê tên berhevkirin û wiha got: "Di bingeha atolyeyê de, dilxwazî heye. Berhemên tên çêkirin bi pereyan nayên firotin. Armanca me ya bingehîn ew e ku di vê sazûmaniyê de xwendekar bi ruhekî kolektîf bi hev re bixebitin."

Çelîk diyar kir ku wan Atolyeya Kîlê di şexsê Polen Unlu ya di komkujiya Pirsûsê de jiyana xwe ji dest da û diyarî hemû têkoşerên azadî û demokrasiyê dikin û got ku li zanîngehan ji ber kêmaniya xebatên çand û hunerî, ew ketin nav hewldaneke wiha.

Çelîk destnîşan kir ku ew di xebatên xwe yên atolyeyê de tenê xebatên çand û hunerî dikin û anî ziman ku ji ber feraseteke ku hunerê wek sosret dibîne destûra xebatên atolyeya wan nayê dayîn û wiha pê de çû: "Hefteya borî, Yekîneyên Ewleyiya Taybet (OGB) afîşên me wek hincet nîşan dan û êrîşî atolyeyê kir. 5 hevalên me hatin derbkirin û atolyeya me belawela kirin." Çelîk piştrast kir ku rêveberiya zanîngehê, OGB û komên nîjadperest wek koalîsyonekê tev digerin û aşkera kir ku ev koma ji 200 kesî pêk tê polîs jî piştgiriya wê dikin.



# Sînemaya kurdî qada berxwedanê ye



ELÎF DOGAN / AMED - ANF

*Sînemager û derhênerê kurd Îbrahîm Yildirim bal kişand ser sînemaya kurdî û aşkera kir ku nirxandina çîrokên li erdnîgariya kurdan gelekî girîng e. Yildirim got ku pêşxistina sînemaya kurdî erkeke wan e*

Kevneşopiya sînemaya kurdî roj bi roj mezintir dibe. Hejmara sînemagerên kurd ên bi sekna xwe ya polîtîk mohra xwe li binê fîlmên nû didin û hejmara derhêneran zêde dibe. Ji bo ku sînemaya kurdî li her qadê belav bikin jî komeleyên nû ava dibin. Yek ji van jî Akademiya Sînemayê ya Rojhilata Navîn e. Ev akademiya sînemayê xebatên xwe li Amedê dimeşîne.

Derhêner Îbrahîm Yildirim 4 sal in li vê akademiyê dixebite, ji sala 2007'an û vir ve gelek kurtefilm, senaryo û rêzefîlm amade kirine. Yildirim karê xwe û rewşa heyî ya sînemaya kurdî ji ANF'ê re nirxand.


Yildirim da xuyakirin ku Akademiya Sînemayê ya Rojhilata Navîn di sala 2012'an de ava bûye û ev tişt got: "Di encama nîqaşeke berfireh de biryara damezirandinê hat dayîn. Ji ber vê yekê; ji bo me kurdan sînema qadeke nû ye û li gorî hejmara hevalên bi vî karî dibilin, komek hat avakirin. Xebatên vê komeleyê, dayîna perwerdeyê, destek û xizmeta li ser vê qadê ye. Ji bilî vê yekê em destekê didin projeyên kurtefîlmên hin hevalên ku dixwazin tev li mîhrîcanê bibin. Piştî ku saziyê ev yek wek armancekê danî pêşiya xwe, biryara yekbûnê da. Vê gavê komeke me heye ku bi giranî li ser nivîsandin û amadekirina senaryoyan disekine. Dema li cihekî pêwîstî pê hebe em perwerdeyê didin."

Yildirim diyar kir ku ew destekê didin dersên sînemayê yên li Akademiya Aram Tîgran, Cegerxwîn û wiha pê de çû: "Hevalên me yên sînemager ên dixwazin li Kurdistanê fîlman bikişînin, em piştgiriyê didin wan jî."

Yildirim têkildarî bandora şer a li ser fîlm û belgefîlman jî agahî da û aşkera kir ku rewşa ku ev sal û nîvek e diqewime, bandoreke neyînî li gelemperiya civakê dike. Yildirim derbirî ku gelek kes ji kar hatin derxistin û li herêmê komkujî pêk hatin û wiha got: "Vê pêvajoyê çawa ku bandor li her qada jiyanê kir, bandor li sînemaya kurdî jî kir. Lê belê dema mirov ji aliyê sînemaya kurdî ve li mijarê dinêre, tê dîtin ku sînemagerên kurd bi giranî di berhemên xwe de qala komkujî, pişaftin û berxwedana li dijî vê yekê dikin. Şopa şer di piranî belgefîlman de tê dîtin."

### 'Erka me pêşxistina sînemaya kurdî ye'

**DERHÊNER** Îbrahîm Yildirim da zanîn ku li gorî demên borî ew hêj bêhtir bi rêxistinkirî ne û wiha dirêjî da axaftinên xwe: "Dibe ku li gorî pergalê em li zemînekî ne meşrû bin. Ya jî dibe ku fîlmên me li hemû salonan nayên nîşandan. Nikarin xwe bigihînin mîhrîcanên navneteweyî. Lê belê em di karê xwe de bi giranî qala çîrokên xwe dikin. Şert û mercên dema bihurî hêj girantir bû. Yilmaz Guney di vî warî de mînak e. Îro derfetên teknolojiyê ne li gorî wê demê ne. Bi kamerayên biçûk gelek fîlm dikarin bi hêsanî werin kişandin." Yildirim destnîşan kir ku cihê Yilmaz Guney lê disekinî û çîrokên vedigot gelekî xurt bûn û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev yek ji bo îro jî derbas dibe. Girîng e mirov li ser vê bisekine. Berpirsyariya sînemagerên kurd e ku vê bi pêş bixin. Civak ji gelek aliyan ve hat parçekirin û êdî nêrînên cuda hene. Mirov nikare civakê weke girseyekê bibîne. Girîng e mirov ji pêvajoya dîjîtal sûdê werbigire û çîrokê rast û di cih de nîşan bide. Em vê qadê weke qadeke berxwedanê dibînin."





# Bo parastina çanda xwe şer dike

Z. NÊRGIZ BOTAN / ZENDA DÎROK / BEHDÎNAN - ANF

Gerîlaya bi navê Bêrîtan Hewraman di nava karên çand û hunerê yê PKK'ê de cih digire, di nava refên YJA Starê de bi awayekî çalak şer dike. Bêrîtan li herêma Hewraman a rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye û di sala 2008'an de tev li nava refên PKK'ê bûye.

Pişti Bêrîtan 6 sal di xebatên çandê de cih digire, derbasî qada leşkerî dibe.

Gerîla Bêrîtan anî ziman ku ji ber welatparêziya malbata wê, di emrekî biçûk de wê PKK nas kiriye û derbarê hezkirina xwe ya ji PKK'ê de ev tişt got: "Piştî ku min PKK nas kir, min hez ji hemû kesên dildarên gelê kurd û şoreşê kir. Ya rast, nêrîna min a li mirovahiyê guherî. Min ciwan didîtin ku ji bakurê Kurdistanê hatibûn û li rojhilatê Kurdistanê şehîd diketin. Wekî din bi deh hezaran ciwan hene ku li parçeyên din ên Kurdistanê ji bo afirandina civakeke azad şer dikin û şehîd dibin."

**'PKK CIHÊ TÊKOŞÎNÊ YE'**

Bêrîtanê li ser sedema tevlîbûna xwe di nava PKK'ê de wiha axivî: "Li rojhilatê Kurdistanê, rejîma Îranê jî mîna dewleta tirk zexteke giran li gelê kurd dike. Bi taybetî îşkenceya li jinan dihat kirin di asteke dijwar de bû. Li çavkaniya jiyanê jinan dihat xistin, îşkence lê dihat kirin û bi recmê dihatin cezakirin. Wijdana min ev rewş lêpirsîn dikir. Ji ber ku ez jî jineke kurd bûm. Diviyabû min li dijî vê rewşê têkoşîn bida. Ji ber vê ez tev li PKK'ê bûm."

**'FELSEFEYA RÊPER APO'**

Bêrîtanê li rojhilatê Kurdistanê demeke dirêj di nava koma muzîkê ya Rojyar de cih girtiye û nêrînên xwe yên li ser çand û hunera di nava PKK'ê de jî wiha vegotin: "Bi taybetî piştî dîtina perwerdeya PKK'ê ez bi guhertina kesayetiya xwe hesiyam. Xebatên çand û hunerê ji bo min her tim girîng bûn. 6 sal in ez di nava vî karî de mam. Min zanîbû, qada herî zêde nirxên gelan lê tê parastin qada çand û hunerê ye. Jin û mêrên kurd, êş û kêfxweşiya xwe ya bi salan bi hunerê nîşan dida. Ev yek carinan bi çand û hunerê, carinan jî bi stranekê dibû dîrok. Felsefeya Rêber Apo vê yekê gelekî hêja dibîne. Wek gerîla em hewl didin çand û dîroka gelekî nîşan bidin û biparêzin."

**LI DIJÎ ZILMÊ ŞER**

Gerîla Bêrîtan piştî demeke dirêj a li qada çand û hunerê derbasî qada leşkerî dibe. Li ser vê mijarê jî Bêrîtanê ev agahî parve kir: "Bersiva herî mezin a li dijî zext û zordariya dewlta tirk a li dijî gel û gerîla, cihgirtina li nava şer e. Bi taybetî ji sala 2015'an û vir ve êrîş roj bi roj giran dibin. Di vê demê de bersiva herî mezin a li dijî dewleta tirk, di şer de cih girtin e."

Gerîlaya jin herî dawî bang li jin û ciwanan kir ku di vê demê de ji bo welat û Rêberê xwe tê bikoşin û gotinên xwe wiha bi dawî kir: "Ev yek erka me ya dîrokî ye. Divê em vê berpirsyariya xwe ya dîrokî bi cih bînin. Cihê herî xweş têkoşîna di nava PKK'ê de ye."



# Serra azadî û serkewtişî

SELAHATTÎN ERDEM



Ma serra 2016 ke dej û qezencê aye gird bî pey xo de verda. Qet şik çin o ke serra 2016 serrêka tewr zaf bi pêrodayîş, şer û xoverdayîş vîyarto ya. Eynî xusûsîyetî bi hawayêko hîna giranêr dewrê serra neweyî benî. Cok ra nika ra yeno famkerdiş ke serra 2017 zî do biba serra şer û pêrodayîşî. Nê semedî ra merdim pîrozkerdişê serrneweyî de zehmetîyan anceno. Labelê reyna zî ma eşkenî vajî emser, serra azadî û serkewtişî ya.

Qet şik çin o ke serra 2016 seba şarê kurd û Rojhelato Mîyanên serrêka zehmetin û serra şerî bî. Şerê Cîhanî yê Hîrêyine Rojhelato Mîyanên de seba şaran rijnayîşanê girdan ard rojeve, faşîzmê AKP û MHPyî zî dejê ke qet nêrî vîrîkerdiş, kurdan da cuyayîş. Her çiqas ke hende hêrişî bîyî zî şarê kurdî vera faşîzmê AKP-MHP û DAIŞî de xoverdayîşêko gird nîşan da û no xoverdayîş Kurdistan de mizgînîya azadî, Tirkîya de mizgînîya demokrasî û seba şarê Rojhelato Mîyanênî zî mizgînîya rizgarbîyayîşî da.

**Qet şik çin o ke serra 2016 serrêka tewr zaf bi pêrodayîş, şer û xoverdayîş vîyarto. Eynî xusûsîyetî bi hawayêko hîna giranêr dewrê serra neweyî benî. Cok ra yeno famkerdiş ke serra 2017 zî do biba serra serkewtişî**

Yeno zanayîş ke kurdî serra 2016 de hetêk ra vera faşîzmê DAIŞî, heto bîn ra zî Cizîr û Sûr de vera faşîzmê AKP û MHPyî de mîyanê têkoşînêko gird de vîyarna. Cok ra 2016 seba kurdan bîye serra şer û xoverdayîşî. Kurdî mîyanê têkoşînê xo yê 40 serran de serra şerê tewr zehmetin û hîra cuyayî. Netîceyî de bedelê ci xeylê giran bibo zî qezencê ci zî gird bîyî û nê qezencî şarê kurd hîna nizdîyê azadîye kerdî.

### PLANÊ ÎNAN XIRA BÎY

Vera faşîzmê DAIŞî de serkewtişê kurdê Rojawanî serra 2016 de zî dewam kerd. Şero ke vera DAIŞî de seba awankerdişê Federasyonê Sûrîyeya Vakurî ame kerdiş, Minbic de resa serkewtişî û nika resayo duştê azadkerdişê Reqqa. No têkoşîn heme planané faşîzmê AKP û MHPyî ke dişmenê kurdan î, xira kerdo û wina kerdo ke Erdogan mecbûr mendo ke bitadîyo û vatişanê xo yê verênan, peyser bigiro. Vera nêyî de qehremanîya şarê kurdî û rêxistinîya demokratîke aver şîyo û eynî wextî de bîyo sebeb ke piştîdayîşêyewbînan yê şaranê ereb û asûrîyan reyde aver şêro. Na çarçewa de ma heme xoverdakarê ke vera faşîzmî de têkoşîn dayî û serkewtî, silam kenî û bi rêzdarî şehîdanê qehremanan yad kenî.

Qet şik çin o ke çîyo ke mora xo da serra 2016 ro; xoserîya demokratîke ke Vakurê Kurdistanî de amebî îlankerdiş bî. Şarê kurd vera faşîzmê AKP û MHPyî ke Amerîka ra zî piştî girewtbî û 24ê temuze de hêrişê qirkerdişî kerdbî de Cizîr û Sûr ra heta Gever, Nisêbîn û Şirnex de xoverdayîşêko topyekun nîşan da. Ko, deşte û bajar de xoverdayîşêko gird ame nîşandayîş û çalakîyê gerîlayan Anqara ra heta Xarpêt û Kayserî xeylê cayan de virazîyayî. Bi vistişê teyaraya şerî resa duştê xo yê tewr berz. Ma tîya ra şexsê Mehmet Tunç û Asya Yuksele de heme şehîdanê xo yê qehremanan bi rêz û minet yad kenî.

### TI WEXTAN DE ÇIN O

Dibare zî bibo, ganî ma tayê çîyan reyna zî vajî. Faşîzmê AKP û MHPyî serra 2016 de wehşeto ke nêda xebetnayîş, nêmend. Bi bombekerdişê goristanan ra bigirî, heta veşnayîşê birîndaran û pey wesayîtî ra kirantişê cenazeyan, her hawayî zulm ame kerdiş. Ewro nê polîtîkayê bi tepiştiş û eştişê şorişgeran yê hepisxaneyan resayo duştê çinkerdişê şorişger û demokratan. Wehşeto ke faşîzmê AKP û MHPyî kerdo, çi wextê derbeya 12ê êlule û çi zî wextê Çiller, Gureş, Demîrel û Agar de daxî nêameybî kerdiş.

Labelê hêzê demokratîkî û kurdî vera nê hêrişanê qirkerdişan de bi hawayêko topyekun xover dayî û bi no hawa bîyî cewab. Serra 2016 de Rayberî, şar, gerîla, sîyaseto demokratîk, ciwan û cinîyî xover dayî.Vatişê Mehmet Tunçî ke vatbî 'Ma vera faşîzmî de sere nêrona, ma reyde îftîxar bikerê' bî siloganê serra 2016î. Xoverdayîşê serra 2016 'planê rijnayîşî' zî serûbin kerdo. Kewtişê hukmatê Ahmet Davutogluyî û teşebusê derbe netîceyê xoverdayîşî de qewimîyayî. Ma hêvî kenî ke serra 2017 do bibo serra mergê sîstemê dagîrker û faşîstî.

Nika têkoşînê tarîxî bi heme hetan dewrê serra 2017î beno. Cok ra ma vanî serra 2017 do bibo serra şoriş û şerî û zanayîşê nêyî zî çîyo ke ecêb nîyo. Hem Kurdistan de û hem zî Sûrîye û Rojhelato Mîyanên de şerêko winasî do vila bibo û dewam bikero. Xoverdayîşê şorişger vera faşîzmê AKP û MHPyî de her waran de û bi zaf hetan ra yeno meşnayîş. Rayber ra heta şarî û cinîye ra heta ciwanan, koyî ra heta bajar û hepisxaneyan her kes xover dano. Heto bîn ra Reqqa, Bab û Mûsil de heme planê AKPyî veng ameyî vetiş. Kurdî qasê ke merdimîye û şarê herême ra piştî gênî, mîyanê xo de zî seba awankerdişê yewîya xo hewldayîşêko gird danî.

### NÊEŞKENÎ BIDOMNÎ

Vera nêyî de sîstemê TCyî rijîyayo û faşîzmê AKP û MHPyî zî wextê xo yê tewr zeyîf cuyeno. Her çiqas ke Erdogan û Bahçelî seba tamîrkerdişê sîstemî zaf hewl bidî zî nêeşkenî netîce bigirî û vernîya rijîyayîşî bigirî. Bitaybetî êdî ti şansê zîhnîyet û sîyasetê qirkerdoxan nêmendo ke polîtîkayanê xo bidomnî.



### XAPÊNAYÎŞÊ KOMELÎ

Îttîfak û têkilîyê ke îdarekarê AKPyî bi Rûsya, Îran û Israîlî reyde ronena û hem ci rê giran yeno û hem zî tim bi dişmenîyêka bîn agêrena ci. Têkilîyê ke heme çîyê Tirkîya kewenî bin îpotekî de serkewtişêko cîddî çin o. Raştîya xo de çîyo ke beno, xapênayîşê komelê Tirkîya yo. Her çiqas ke hende şantajî kerdbî zî hîna zî AKP û Yewîya Ewropa çepê yewbînan de yî û weçînayîşê Amerîka zî aleyhê AKPyî de binetîce bî. Seba ke AKP nînan zano, heta ke Amerîka dest bi karî nêkerda û kurdî bi hawayêko aktîf hêriş nêkerdî, wazeno Bab bigiro û bi tehdîtkerdişê Şengalî xo payan ser de tepişeno. Labelê Bab nika ra agêrayo rewşêka batax û eke dagîrkerîya Şengalî bibo, o wext Tirkîya do hîna zafêr bikewa mîyanê bataxîyêka hîna kûrêr.

Bi hawayo aşkere aseno ke eke Tevgerê Azadîya Kurd û şarê kurd 2017 de zî sey 2016 do xoverdayîşê xo bidomno, û do qezenc bikero. 2017 do seba faşîzmê AKP û MHPyî bibo serra rijîyayîşî. Duştê ci de seba şarê kurd zî do bibo serra azadî û serkewtişî. Tabî no zî ancax bi xoverdayîşêko antîfaşîst mumkun o.

Na çarçewa de ma serrneweyê heme şar û hêzê demokratîke pîroz kenî û seba înan serkewtiş û azadî hêvî kenî.

## Seba koçberan hetkarî ame kerdiş

Meclîsê TEV-DEMî yê Kobanê hetkarî da koçberê ke Reqqa ra ameyî û bajarokê Mehmûdîye de bi ca bîyî. Şerwanê Odeya Çalakîye ya Xezebê Firatî peynîya şerê 3 rojan, 1ê çeleya 2017 de Mehmûdîyeya Reqqa çeteyanê DAIŞî ra pak kerdbî. Şerwanî seba pawitiş û weşîya sîvîlan, sewqî Mehmûdîye kerdî. Meclîsê TEV-DEMî yê Kobanê seba keyeyê ke Reqqa ra koçê bajarokê Mehûdîye bîyî, mazot û nan vila kerd. Şerwanê ke Xezebê Firatî de ca gênî, vera çeteyanê DAIŞî de sîvîlan sewqê cayê biewle kerdî. Şerwanî sewqîyatî ra dima zî seba koçberan hetkarî kenî. REQQA




## Katarakt her kes de yeno dîyayîş

Nêweşîya kataraktî mîyanê şarî de sey 'perde ameyîşê ser çimî' yeno zanayîş, tena extîyaran de nê, bebek û ciwanan de zî yeno dîyayîş. Babete ser o Opr. Dr. Fatma Caner Genîşogluye va 'nêweşîya kataraktî mîyanê şarî de sey nêweşîya extîyaran yena zanayîş, labelê katarakt tena extîyaran de nê, ciwan û bebekan de zî yena dîyayîş' û wina domnaye: "Katarakt beno ke pîzeyê dayîke de derbazî bebekî bibo. Nêweşîya kataraktî bi hawayo asan yena teşhîskerdiş. Nêweşîya kataraktî ya ke zaf aver şîya, ancax bi amelîyat tedawî bena. Roja ma ya ewroyên de na nêweşî bê narkoz û derzîn, bi rayîrê lazerî zî tedawî bena. Ez seba nêweşîye verçimikanê tîje pêşnîyaz kena." AMED



## Wendekarî do zemîro notr bixebetnî


Wendekarê Unîversîteyê Teknîkî yê Rojhelato Mîyanên (ODTU) seba ke sîstemê zayendî yê dîyine orte ra wedarnî, kewtî mîyanê têgerayîşî. Wendekarê beşa Psîkolojî Murat Korkmazî derheqê babete de wina va: "Raştîya xo de mi û embazê mi Arda çend serrî yo ke ma qala nê çîyî kerdêne. Seba ke ziwanê perwerdeyî yê unîversîteyî îngîlîzkî yo, ma tim vatişanê he/she (o/a) eşnawitêne. Ma tim vatêne ganî herinda he/she de they an zî zemîrê notr bêro xebetnayîş. Labelê ma hewteyêk verê qerar girewt, qe nêbo ma do beşa xo de nêyî bidî destpêkerdiş. ANQARA



# Qirkerdişê Dêrsimî yo dîyin o

**Endamê Komîteya Bawerî û Şaran yê KCKyî Cîhan Erenî derheqê dagîrkerîya tirkan de wina va: "Hedefê dagîrkerîya tirkî serra 1925 ra nata asîmîlekerdiş û tirkkerdişê kurdan o"**

ROSA ÎKARUS / BEHDÎNAN - ANF



Endamê Komîteya Bawerî û Şaran yê KCKyî Cîhan Erenî derheqê dagîrkerîya tirkî û polîtîkayê îmarî yê dewleta tirkî ke hêrişan ra dima nika wazena Kurdistan de awan bikera de vînayîşê xo ard ziwan.

Erenî qiseykerdişê xo de bale ant meseleyêka ke wextê Qirkerdişê Dêrsimî de ameya cuyayîş û wina va: "Yeno vatiş ke o wext şar seba ke bêro kiştiş, cayêk de yeno komkerdiş û leşkerî zî seba gule bireşanî xo amade kenî. Vernîya ke nê kesî bêrî kiştiş, dûrî ra yew espar yeno dîyayîş. Espar vano, 'talîmat ameyo û nê kesî efû bîyî, nika ra pey do mergî nêbî.' Nê vatişî ra pey kesê ke heta nika mergî ra zêde çîyêko bîn nêfikirîyayêne, qatilê xo sey xelaskerdoxê xo vînenî. Qirkerdişê kulturî zî çîyêko winasî yo. Sîyasetê Kurdistanî yê faşîzmê tirkî yo dagîrkerî zî na nimûne ser de ameya awankerdiş. Na dagîrkerdiş merg û çinbîyayîşî ra zêde şansêko bîn nêdano kurdan."

**PLANÊ ÎSKAN Û ÎMARÎ**

Erenî va 'qeza û bajarê kurdan ameyî veşnayîş, rijnayîş û nika newe ra yenî dîzaynkerdiş' û wina domna: "Goreyê nêyî kultur, nasname û têkilîyê kurdan yenî xirakerdiş û herinda ci de dagîrkerîya tirkan wazena têkilî, nasname û kulturê goreyê xo bida awankerdiş. Bi TOKÎyan bingeyê sosyalî yê komelî yeno rijnayîş û vera kulturê Botanî de hêrişêk o. Bi TOKÎyan wazenî komelî mîyanê awanîyanê girdan de hepis bikerî. Komara Tirkîya bi hêrişê ke 1925 ra nata şarê kurd ser de kena, nika zî hêrişê Şirnex kena. Cok ra hêrişê ke Şirnex ser de yenî kerdiş, Qirkerdişê Dêrsimî yo dîyin o. Ti cîyayîya nînan polîtîkayanê 1925 û 38î ra çin a.

Erenî tewr peynî va 'dewlete hetêk ra hêrişê piştdayîş û hetkarîyanê kurdan kena û heto bîn ra zî kurdan muhtacê dewlete û rêxistinanê dewlete kena' û wina qedêna: "Ganî ma qet xo vîra nêkerî ke dewlete estena kurdan seba xo merg vînena. Vera dewletêka winasî de tena rayîrêk esto, o zî xoverdayîş o. Senî ke dewlete dagîrkerîya kulturî virazeno, ganî ma zî xoverdayîşê kulturî nîşan bidî."

### Devlete kurdîya ma hedef gêna

**ERENÎ DEWAMÊ** qiseykerdişê xo de dîyar kerde ke 'nizdîbîyayîşê dewleta tirkî dagîrkerîye ra zêde çîyêko bîn nîyo' û wina va: "Dewlete verê komel dekena pozîsyonê sucdarî, dima ra xo sey xelaskerdox, baş û dost nîşan dana. Bi no hawa hewl dana çîyê ke ameyî ser komelî, sucê komelî ver bîyo, bida nîşandayîş. Yanî wina yeno kerdiş ke komel pratîkê xo ra şerm keno û poşman beno. Yanî dagirkerîye vatişê 'eke ma kurdbîyayîşê xo nêardê ziwan û ziwanê xo de israr nêkerdêne, nêyî nêameyêne sereyê ma' aver bena. Ganî ma nê raybazî qet xo vîra nêkerî. Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî no derheq de vatbî 'wazenî şexsê Colemêrgî de şarê Botanî bikerê dêrsimij û bikî Tuncelî.' Çimkî o wext yê ke tewr zaf xover dayêne şarê Botanî bî û dewleta tirk seba ke şarê Botanî poşman bikero, polîtîkayê çinkerdişî meşnayêne. Çîyê ke Sûr, Cizîr û Nisêbîn de ameyî cuyayîş parçeyê na polîtîka bî. "

# Bîlançoya OHALî aşkere bîye

15ê temuze teşebusê derbe ra nata reya dîyin a ke rewşa îstîsnayî (OHAL) yena dergkerdiş. Îlankerdişê OHALî ra dima xeylê neheqî û bêhuqûqîyî ameybî cuyayîş.

Hetê Wezaretîya Edaletî ra bîlançoya 6 aşman yê OHALî ameye aşkerekerdiş.

Goreyê bîlanço; 15ê temuze ra nata pêro pîya 204 kesî merdî, 41 kesî ameyî tewqîfkerdiş û derheqê 122 hezar kesan de tehqîqat dîyayo destpêkerdiş. Mîyanê kesê ke ameyî tewqîfkerdiş de 12 parlamenterê HDP û 69 hemserekê Şaredarîyanê DBPyî zî estî.

**XEYLÊ TEQAYÎŞÎ**

Reyna goreyê bîlanço 87 hezar kesî karî ra îxraç bîyî, 35 kesî zî karî ra ameyî dûrîvistiş. Bîlanço de yeno vatiş ke mîyanê nê 6 aşman de Çewlig, Xarpêt, Dîlok, Şirnex, Yenîbosna, Amed, Colemêrg, Mêrdîn, Edene, Beşîktaş, Kayserî û Ortakoy de hêrişê bombeyî virazîyayî.

**ZAF SAZÎYÎ PADÎYAYÎ**

Bîlanço de hûmara sazîyê çapemenîye ke ameyî padayîş zî ameya aşkerekerdiş. Goreyê bîlanço 177 sazîyî ameyî padayîş û nizdîy3e 2 hezar û 500 rojnamegerî bêkar mendî, 144 rojnamegerî zî tewqîf bîyî û karta çapemenîye ya 780 kesan ameyo betalkerdiş.

Reyna mîyanê nê 6 aşman de 104 weqfî û 1125 komeleyî ameyî padayîş. *AMED*




# Fatma Hesene verê edetan de sere wedarnaye

Trajedîyî her cayê welatî de nêqedîyenî. Her kerraya ke yena wedarnayîş binê ci de cu û hîkayeyê cîyayî vejîyenî orte. Hîkayeya Fatma Hesene ya ke 12 serrîya xo de bi hawayo berdêl ameybî zewecnayîş zî înan ra yew a.

Fatma Hesene ke bajarê Girkê Legî de ameybî dinya qala zehmetîyê ke antî kerde.

Fatmaya 45 serreyî qiseykerdişê xo de wina va: "4 wayê mi estî. Ez hema domano ke 12 serreyî bîya pîyê mi birayê mi reyde mi kerd berdêl. Pîyê mi maya mi ser de zî hewî ard. Hedefê pîyê mi o bî ke domanêko ci yê lajek bibo. Pîyê ma qet ma û maya ma nêfikirîya. Badê ke ez zewecîyeya mi fek mêrdeyê xo ra verada. Ez bîya qurbanê urf û edetê komelî."

Fatmaye qiseykerdişê de wina va: "Tecrubeyê cuye hêz da mi. Mi tay kesan ra moralê serkewtişî girewt. Înan ra yew zî waya mi Hevîdara ke tewrê warê azade bîbî û cuyê xo vînî kerda. Mi vera zehmetîyê cuye de her wext waya xo, xo rê fînak girewt. Seba ke maye û pîyê min merdî, ez waya xo Hevîdare ra tepîya menda û beşdarê şerê azadîye nêbîya. Barê keyeyî milê mi ser de mend. Ez do tim bi hêzê waya xo şerê azadî de ca bigira." *ŞÛJIN - RIMÊLAN*

# Pere dest de helîya

Her ke heqdestê kedkaran rê zam beno dima ra weşî, were, mazot û sewbîna lazimîyê merdimanî rê zî zam yeno kerdiş. Hukmatî zamê heqdestî yê kedkaran sey 404 TLyî dîyar kerd.

Babet ser o karkerî qisey kerdî.

Can Baltayo ke karê pakkerdişî keno, wina va: "Tirkîya de karkerî sey kole yenê xebetnayîş. Rayîrê xelisîyayîşê karkeran yewîye ra vîyareno. Wa sendîkayî vera neheqîya ke karkeran ser de bena de bêveng nêmanî. Ez merak kena; gelo parlamenterê ke qerarê zamî dayî, eşkenî pê nê pereyî bicuyî?"

Ayhan Turalo sanayî de xebetîyeno zî wina va: "Hukmat, çîyêko pê kewçike dano ma, pê kepçe ma ra gêno û karmendan ser de şîdetê ekonomî ramneno. Talebê patronan yeno ca. Bacê karker û patronan yew a. Na zî dizdêya karkeran a. Pereyê ma şono herînayîşê sîlehan. Ma na qebul nêkenî."



Serekê DÎSK Genel -Îşî yê Şubeya Îzmîrî Alî Haydar Karayî zî wina va: "Merdim nêeşkeno pê heqdestê hukmatî bicuyo. Karmendî şertê seserra 18.yî de cuyenî. Verê cû 6 aşmî de reyêk zam ameyêne kerdiş, la AKP kerd serr de reyêk. AKP îqtîdarîya xo ya 15 serran de çîyêk nêkerdo. Îlîm rê nê Dîyanet, rant û mergî rê butçe ameya cîyakerdiş. *ÎZMÎR - DÎHABER*

www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
5 Çile Pêncşem 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına


İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
Yönetim Yeri: Kooperatifler
Mahallesi Akkoyunlu
4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
Yenişehir-DİYARBAKIR

Tel: 0 (412) 224 35 93
Baskı (ÇAP):
İstanbul: Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler
Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece İSTANBUL
Tel: 0 (212) 580 63 81
Adana: Arslan Güneydogu
Gazetecilik,
Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
No:13/A Yüreğir / ADANA
Tel:0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
e mail:
rojevamedya@hotmail.com









ABDURRAHMAN GOK / MINBIC - DÎHABER

## Mîrateya 2 hezar salan

# Keleha Necmê

Mekanên ku mîrateya cîhanê ne û hîn jî der barê wan de lêkolînên teqez nehatine kirin, bi şer re winda bûn. Di dema şer de kesên ku bi dirûşma "ji bin zilma Esad, rizgarkirina gel" rahiştin çekan, di demeke kin de wergeriyan artêşên talanê û berhemên dîrokî yên ku dikaribûn hilgirin dizîn û yên nikaribûn hilgirin jî li ber çavên hemû cîhanê bi teqemeniyan an jî bi mîrkutan hilweşandin.

Cihekî ku ji vê talanê nesîbê xwe girt û gelek berhemên wê hatine dizîn jî Keleha Necmê ye. Keleha ku girêdayî bajarê Helebê ye, di nav sînorê Minbicê de li kêleka çemê Firatê cih digire. Diyar e ji ber ku xwedî cihekî stratejîk e, ji hêla çeteyên DAIŞ'ê ve bi temamî nehatiye rûxandin.

Piştî adara 2011'an Minbic di 12'ê tîrmeha 2012'yan de li gel Keleha Necmê kete bin kontrola Artêşa Azad (OSO). Di 21'ê çileye 2014'an de DAIŞ'ê Minbic, li gel Keleha Necmê ji destê OSO'yê derxist û dagir kir.

Çeteyan çekên giran li kelehê bi cih kirin. Şibakeyên di bircan de ku berê li gorî tîrvanan teng hatine çêkirin, fireh kirin û mewziyên doçkayan lê bi cih kirin. Li qata duyemîn a kelehê, di 2 odeyan de kunên destav û serşokan vekirin. Di rêyên veşartî yên di nav kelehê de ku tê gotin xwe berdidine çemê Firatê, bi kompresoran qul vekirin û texrîb kirin. Li gorî rîwayetê, rêyeke veşartî ji nav kelehê, xwe berdide Çemê Firatê û di bin çem re wekî tunelekê darbasî milê Sirrînê dibe. DAIŞ ji bi kompresoran li vê rêyê geriyaye.

Di 23'yê tîrmeha 2016'an de Keleha Necmê ji hêla şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê ve hat rizgarkirin. Bi vî awayî keleha dîrokî ji texrîbateke mezintir xilas bû.

Keleha ku 118 kîlometre dûrî Helebê ye û 30 kîlometre dikeve rojavayê Minbicê, tê texmînkirin ku beriya zayînê di salên 100'î de ji hêla Romayê ve hatiye avakirin.


Romayiyan li ser zinarê girekî ku çemê Firatê dibîne wekî 2 qatan, bi şêweyê lakêşeyî çêkirine. Tê texmînkirin ku li hemberî tehdîdên sasaniyan, bi awayekî kelat (hîsar) ji bo kontrolkirina rêyan, wek tesîseke leşkerî ava kirine.

### DÎROKA KELEHÊ


Piştî zayinê di salên 300'î de li kêleka çemê Firatê, li derdora vê kelehê di navbera Pers û Romayê de şerekî mezin diqewime û tê gotin Roma di vî şerî de têk diçe. Di salên 700'î de ji ber şerên demdirêj ên bi persan re Roma ji hêza xwe dikeve. Di vê demê de ebbasî xurt dibin û di sala 750'yan de xelîfetî û desthilatdariyê digirin destên xwe. Bi vî awayî li herêma Helebê jî cihên stratejîk dixin bin kontrola xwe.



Di 5 salên dawîn ên şerê Suriyeyê de, tenê bi sedhezaran mirov nehatin qetilkirin. Di heman demê de bi hilweşandina cihên dîrokî û texrîbkirina mîrateya mirovahiyê re bîra mirovahiyê jî derbên giran xwarin







Destpêkê di sedsala 7'an de di nivîsarên erebî de bi navê 'Keleha Cisr Minbic', ev keleh cih digire. Tê texmînkirin ku di sala 526'an de di erdheja Antakyayê de dîwarê bakurê kelehê hildiweşe.

Di dawiya serdema ebasiyan de, êdî li Mûsilê Dewleta Zenkiyyûn (Zengî) ava dibe. Bi vê yekê re Nureddîn Mehmûd Zengî dibe begê Helebê. Di navbera salên 1146-1174'an de Nureddîn Zengî, dîwarê bakur ê Keleha Necmê ku di erdhejê de hilweşiyabû, înşa dike.

Bi mirina Nureddîn Zengî re êdî eyyûbî li herêmê hikum dikin. Selaheddîn Eyyûbî jî berî ku bimire, welatê di bin hikmê eyyûbiyan de, li zarokên xwe parve dike. Heleb, Hârim, Tel Bâşir, Ezez, Derbusak û Minbic dikevin bin îdareya kurê Selaheddîn Eyyûbî Melik Zâhir Qazî. Ji neviyên Selaheddîn Eyyûbî Ebu Feth Ebu Mensur Giyasettîn El Melik El Zahir Qazî ibn Selaheddin Yûsûf îbn Eyyûb (1173-1216) dema li kelehê bi cih dibe, navê wê dibe Keleha Mensûriye. Di hin rîwayetan de jî tê gotin ku dibe navê 'Mensûriye' ji Mensûrê (754) birayê xelîfeyê ebbasiyan Ebu Ebbas Seffah mabe. Di ketina kelehê de li jora derî li milê rastê di kîtabeyeke kevirî de jî navê "Qel-et El Mensûriye" (Keleha Mensûriye) cih digire. Her wiha li gel nivîsa "Xwedê rehma xwe li Melîk Zahir Qazî bike" navê mîmar Îbrahîm îbn Nabe El Minbicî jî di heman kîtabeyê de nexşkirî ye.

Di serdema kurê Selaheddîn Eyyûbî Melîk Zahir Qazî (1208-1215) de ku waliyê Helebê bû, li kelehê bi kîremîtên axa sor gelek cih hatine zêdekirin. Mizgeft, hemam, eywan, çarşiya ku li her du kêlekên wê odeyên gumbet hene, qesreke biçûk û kîtabeyên bi erebî li ser kevirên mezin hatine nexşkirin, li kelehê hatin zêdekirin. Her wiha Zahir Qazî hewzeke avê ya biçûk di şiklê stêrkeke (necm) 8 koşeyî de çêdike. Tê texmînkirin ku bi vê yekê xwestiye keleh êdî bi navê kalikê wî Necmeddîn Eyyûbî bê zanîn. Dîsa stêrka 8 koşeyî tê gotin ku îşareta 8 rêgezên wekî tebat, şikir, dilsozî, dilovanî, rastî, veşartina siran, xwe kêm dîtin û comerdiyê ye.

Piştî Zahir Qazî êdî ev keleh bi navê Keleha Necmê tê nasîn. Di sedsalên 13-14'yan de di dema îstîlayên moxolan de Keleha Necmê jî zirar dibîne. Dîsa di dema belavbûna Împaratoriya Osmanî de hin eşîrên bedewî yên li derdora Keleha Necmê ne, serî radikin. Osmanî jî di sala 1820'an de ji bo vê serhildana ereban têk bibin, bi artêşê êrîşê dibin ser kelehê. Li gel hemû êrîşên giran jî nikare bi eşîrên bedewî. Di vê êrîşê de jî Keleha Necmê zirarê dibîne û hê jî di dîwarên milê rojavayê kelehê de şopên êrîşan hene. Keleha Necmê li gel hemû êrîşan hebûna xwe gihandiye roja îro.

### MÎMARIYA KELEHÊ

Keleh li ser zinarekî saxlem li serê girekî ku hakimê derdora xwe û çemê Firatê ye hatiye avakirin û li gel dîwarên kelehê xwedî rêyên parastina xwezayî ne jî, ji rojhilat ber bi rojava ve 170 metre dirêjahî, ji bakûr ber bi başûr ve 130 kîlometre firehiya kelehê heye. Di navbera Iraq û Suriyeyê de li kêleka çemê Firatê ji bo kerwanan cihê derbasbûnê ye. Dîwarên kêleka kelehê rast hatine avakirin. Lê li aliyê deriyê kelehê ku li Firatê dinihêre kevir dema ber bi jor ve hatine risandin di şikle nêrdewanê de 4-5 santîm ber bi hundir ve hatine rêzkirin. Bi vî awayî keleh hem li hemberî afetên xwezayî hem jî li hemberî êrîşên giran bi mîmariyeke balkêş hatiye parastin.

Dîsa li derdora kelehê di tehtê de xendekên bi firehiya 8-9 metre hatine kolandin. Li devê derî jî xendekeke 7 metre kûr hatiye çêkirin.

Ji bo parastina kelehê, gelek bircên bi şiklên cuda ava kirine. Di van bircan de ku hin jê çargoşe, hin lakêşe, hin jî sêgoşe ne, cihê tîrevanan hatine çêkirin.

Di dema êrîşekê de, tiştên yekem kelehê diparêzin xendek in. Ger êrîşkar ji xendekan derbas bibin, îcar rastî dîwarên rast û bilind tên. Ger bixwazin bi van dîwaran ve hilkişin jî ji hêla tîrevanan ve têne bêbandorkirin.

Yekane deriye kelehê ku li Firatê dinihêre ji hêla 2 bircan ve tê parastin. Li ser kîtabeyeke keviri ku li jora derî ye bi erebî medhê Zahir Qazî hatiye kirin. Dîsa li ser kevirên mezin ji giran jî nivîsên behsa eyyûbiyan dikin, hatine nexşkirin.

Di jêrzemîna kelehê de depoyên çekan, depoyên avê, bircên parastinê, gor û rêyên veşartî hene. Di qata yekemîn de qesreke biçûk, salonên mêvanan, hemam, tifik, bircên parastinê yên tîrevanan, çarşî, odeyên gumbetî yên deriyê wan li vê çarşiyê dinihêrin û axoyên hespan hene. Ji bo girêdana hespan jî kevir hatine qulkirin. Dîsa li vê qatê odeyeke ku genim dihêre û dike ar jî heye û hîn jî kevirên aş di odeyê de ne.

Balkêş e di avahiyên nav kelehê de qet şibake tune ne. Ji bo ronahî û sîrkulasyona hewayê jî di jora odeyan de kun hatine vekirin.

Li qata duyemîn ku hemû derdora Firat û çiyayan xuya dike, çend avahî hene. Li vê beşê mizgefteke biçûk, hemam û odeyên bêhnvedana fermandaran hene.

Dîsa di kelehê de rêyên veşartî ku ji qata duyemîn ber bi zemîna kelehê ve diçin hene. Ji van rêyên veşartî yek, piştî demekê dibe 2 rê. Rêyek dadikeve kêleka Firatê. Bi deriyekî kevirî yê dîrokî ev rê hatiye parastin. Rêya din jî piştî 10-15 gavan dixitime. Li gorî rîwayetan îhtîmal e rêya xwe berdide binê Çemê Firatê ev rê be. Çeteyên DAIŞ'ê diyar e bi kompresoran xwestine tehtê qul bikin. Dîsa li çend odeyan jî ji qulên ku bi kompresorê hatine vekirin diyar dibe ku DAIŞ li rêya veşartî geriyaye.

Li ser avahiya ku ji hêla rejîmê ve ji bo parastina kelehê hatiye çêkirin, hê jî şopên şer hene. Navê DAIŞ'ê bi tîpên erebî li ser dîwar e. Dîsa şopa gelek guleyan heye.

DAIŞ'ê her çi qas keleh nerûxandibe jî, li goristana dîrokî ya derveyî kelehê 2 cihên dîrokî hilweşandine.

Bi rizgarkirina Keleha Necmê re careke din mirov dikarin vê keleha ji gelek şaristaniyan re mazûbanî kiriye, ziyaret bikin. Her roj bi dehan welatî ji herêmên din ên Rojava û kesên ji derveyî welat tên Rojava, vê keleha dîrokî ku li gel hemû êrîşan li ser piya maye, ziyaret dikin.



www.arsivakurd.org